


## Tu kî yî

Tu dîsa jî Tu be heyra û bi xwebûna xwe, van hemûyan pûç bike. Jixwe dema Tu, Tu ...bî ew nikarin tiştek bikin. Meqes û dûzan û qelemên wan dişkên û li wan vedigerin. Mirovên xweşik, çeleng û wêrek, jinên dilêr... *Mizgîn Ronak/R.2*



## Aştî û êrîş bi hevre dibin?

Ka em gotina dawiyê pêşiyê bêjin; ji bo destê Rêber Apo lawaz bihêlin, lawaz bixin êrîşên xwe yên li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê dewam dikin. Yên êrîşan aşkere didin meşandin û li ber çavan tên xuyakirin, de be ku... *Ahmet Aktaş/R.8*



## Hevdîtinên Trump-Erdogan

Di serdema serokatiya Joseph Biden de, serokkomarê Tirkiyeyê qet li Qesra Spî hevdîtinek şexsî nekir û têkilî pir aloz bûn. Aloziyên siyaseta derve di navbera her du hevalbendan de jî pir zêde bûn. Xistina droneke Tirkiyeyê li... *Kurdistan Lezgiyeva/R.7*


13 - 19 Cotmeh 2025
Hejmar: 304
Buha: 20
rojname@xwebun.org

# xwebûn

xwenasîn e


## Kurdên dilpola têk naçin

Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, herdu taxên ku tê de kurdan kurdayetiya xwe li hember celadên gelê kurd parast û bi xwîna zarokên xwe dîrokeke nû ji serhildan û berxwedanê nivîsand. Her çendî hêzên derve di serî de dijminê avakirina statuya kurdan dewleta tirk, xwestibe di şexsê van herdu taxan de kurdan di nav pencên siyasetên xwe yên qirkirinê de bifetsîne jî, gel biryara 'ev qad qada me ye û yan serkeftin yan jî mirin' di rûyê van hêzan de berz kir. Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li bajarê Helebê di dirêjahiya şerê Sûriyeyê de ji taxên herî zêde ku rastî binpêkirinên mafên mirovan ên Rêjîma Bassê ya hilweşiyayî û... *Lîlav Elî/R.2*

## Tirkiye li Sûriyeyê çeteyan bi rêxistin dike




Di 20ê çileya 2018an de, Tirkiyeyê Efrîn dagir kir. Piştî dagirkirinê, komên El Emşat û El Hemzat li vir bi rêxistin kirin. Di rapora Komîsyona Lêkolîna Navneteweyî ya Serbixwe ya Sûriyeyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ku sala 2020an hat weşandin, hatiye belgekirin ku li Sûriyeyê, bi taybetî li herêmên wekî Efrînê ku kurd lê dijîn, koma Emşat bi fermana Ebû Emşa sûcê li dijî mirovahiyê dikin. Berpirsê Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê Îbrahîm Şêxo, têkildarî komên Emşat û Hemzat agahî dan û got: "Komên Emşat û Hemzat her çend di bin baneyê parastina giştî ya Şamê de bin jî destekê ji dewleta tirk digirin. Fermandarê wan girêdayî dewleta tirk e. Ev kom li Heleb, Efrîn û Şehbayê xwe birêxistin dikin. Li van bajaran bi hezaran endamên wan ên çakdar hene. Parastina Sûriyeyê li Helebê cih daye wan. Ev kom piştgiriya lojîstîk ji hikûmeta demkî ya Sûriyeyê digirin. Lê heta niha girêdayî Tirkiyeyê ne. Tirkiye piştgiriyê dide wan..." *R.3*

# Pêvajo di bin tecrîdê de ye




Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji 15ê Sibata 1999an vir ve li Girava Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de dijî. Lê tevî tecrîda girankirî ya li ser jî berxwedana xwe ya ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd berdewam kiriye. Tevî tecrîda li ser hê jî didome di encam berxwedana wî de li Tirkiyeyê li ser çareserkirina pirsgirêka kurd xebat tên meşandin. Parêzvana mafê mirovan Reyhan Yalçindag Baydemir der barê pêvajoya heyî û tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wiha axivî: "Li gelek welatên cîhanê ji bo çareseriya pevçûn û şeran rêbazên taybet hatine ceribandin. Hin ji wan bi awayekî cidî serkeftî bûne û veguherîne aştiya mayinde. Ji bo ku ev pêvajoya heyî serkeftî bibe, divê biryarên DMME û Dadgeha Makezagonê werin bicihanîn û rê were vekirin ku muxalafeta kurd ku derketiye derveyî rêbaza çekdarî siyasetê bike. Madem aktorê sereke yê pêvajoyê birêz Ocalan e, wê demê divê, bê ku dereng bibe û hêviyên aştiyê tune bibin, divê qanûnên pêwîst werin derxistin. Li aliyê din, ne rast e ku mirov ji kesekî di bin tecrîde hêvî bike ku pêvajoyê bi rê ve bibe. Tenê carekê parêzer çûn hevdîtinê û Heyeta Îmraliyê bi awayekî sînordar bi Abdullah Ocalan re hevdîtinê dike, lewma ev yek nayê wê wateyê ku tecrîd rabûye. Çareserî ew e ku mafê hêviyê were bicihanîn ku biryara DMMEyê ya 2014an jî vê yekê dibêje..." *Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4*

## Destwerdanên navneteweyî

Nûnerê taybet ê Serokê Amarîkayê Donald Trump Tom Barrack û fermandarê CENTCOMê Admiral Brad Cooper, 6ê cotmeha 2025an, li rojhilatê Sûriyeyê bi fermandarê giştî yê HSDê Mazlûm Ebdî û hevseroka Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Îlham Ehmed re civiyan. Li gorî daxuyaniya Barrack, mijarên civînê "nîqaşên kûr" li ser yekîtiya Sûriyeyê, parastina li dijî DAIŞê û pêkanîna peymana 10ê adarê bûn. Piştî vê civînê, hêzên ewlehiyê yên Hikûmeta Demkî ya Şamê hemû rêyên ku diçin taxên bajarê Helebê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê girtin. Ev tax, ku zêdetirî 100 hezar kurd lê dijîn, li gorî peymana... *Felemez Ûlûg/R.6*

## Erdogan bi Hamasê re têkilî danî

Di navbera Hamas û Îsraîlê de agirbest pêk hat. Ev bi biryara Amerîka û Trump pêk hat. Lê ka binêrin bê bi navbeynkariya kê? Bi navbeynkariya kesekî ku li erd û ezman dijminatiya kurdan dike, bê sedem serokên kurdan birêz Ocalan, ji parlamentarên kurd Selehattîn Demirtaş, Fîgen Yuksekdag, Leyla Guven, Semra Guzel, Nazmî Gur, ji şaredarên kurd Selçûk Mizrakli, Ayşe Gokhan, Bekir Kaya û ji endamên komîteya navendî gelek kesan diavêje zindanê û tevî biryarên dadgehên neteweyî û navneteweyî naxwaze wan berde. Yek ji van jî li hember dewleta tirk çek bi kar neaniye, lê HAMASê li hember... *Hesen Huseyîn Denîz/R.7*

## Ji bo azadiya kurdî

Saziyên zimanê kurdî û Platforma Saziyên Demokratîk dê di 15-16ê cotmehê de li Wanê bi şiara "Azadiya zimanê kurdî di destê me de ye" Komxebata Stratejî û Polîtîkayên Têkoşîna Ji Bo Kurdî li dar bixin. Hevberdevkê Komîsyona Ziman, Çand û Hunerê ya DEM Partiyê Heval Dilbihar, têkildarî xebatê de wiha axivî: "Komxebat li ser navê gelek saziyên zimanê kurdî û platforma saziyên demokratîk, ku di nav de hemû qad, partî û saziyên kurd ên demokratîk ên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê cih digirin tê lidarxistin. Komxebata me dê li ser mijarên zimanê kurdî û stratejiya û polîtîkayên têkoşîna ji bo zimanê kurdî nîqaş bike. Dîsa di têkoşînê de têkilî, girîngî û rista jin, zarok, ciwan, çand, wêje, huner, siyaset, çapemenî, weşangerî, ekoloji, perwerdehî, tenduristî, bîr û bawerî, û rêveberiyên xwecihî, hiqûq, dîplomasî û gelek xal û mijarên din niqaş bike..." *R.3*

## 'Divê ciwan ji hişbirê rizgar bibin'

Hevberdevka Platforma Şiyar Be ya têkoşîna li dijî tiryak û hişbirê parêzer Gulşen Demîr der barê xebatên xwe axivî û got: "Piştî deklareyê ku em daketin kolanan, me dît ku li gelek bajarên Kurdistanê ev pirsgirêka tiryak û hişbirê gelekî bandorê li gelê me dike. Ji ber wê yekê li her bajarê ku em çûnê, ji me xwestin ku em nûnertiya 'Şiyar Be' li wê derê jî ava bikin. Me jî li Şirnex û Êlihê bi nûnerên saziyên demokratîk re xebat û tecrûbeyên xwe yên di pêvajoya platforma 'Şiyar Be' de bi wan re parve kirin. Li van her du bajaran jî Platforma Şiyar Be hat avakirin. Niha bajarên Wan û Mêrdînê jî li benda me ne ku em li wan deran parvekirinên xwe bikin ku ew jî platforêmên xwe ava bikin. Piştre jî li bajarên din dê ev xebat bidome. Me li ser sê komisyonan xwe ava kiribû. Yek jî wan, komisyona rêxistinbûyînê, ya din komisyona çand û çapemeniyê bû. Ya din jî komisyona perwerdehî û stratejiyê bû. Hevalên me yên di komisyona perwerdehî û stratejiyê de ji bo materyalan xebatên xwe berdewam dikin. Divê saziyên sivîl ên civakî, partiyên siyasî û şaredariyên me her wiha bijarteyên vî gelî wekî, parlamenter, hevşaredar û hevsrokên partiyên me jî di nav van xebatan de cih bigirin. Lewre dê ev xwetevlêkirin ji bo pêşketina xebatên me û ji bo mînakgirtina gelê me hîn baştir be... *R.8*




## Demokrasîyo muzakerevan

Demokrasîyo muzakerevan Yew formê demokrasîyo bîn "demokrasîyo rasterast" o. Nê tewrê demokrasî de serdestîye hetê şarî ra rasterast yena xebitnayene. Yanî derheqê dewlete yan îdareyî de heme qerarî bê mabênkar gêrîyenê. No formê demokrasî formo ke demokrasîyê îdealî rê tewr nêzdîyo. Yeno fikrîyayene ke verê cû şaristananê yunanan de yanî "polîsan" de şar raşteyan de ameyêne têlewe, derheqê persan de nîqaşî kerdêne û netîce de qerarî girewtêne. Dima ra nê qerarî dîyêne îdarekaran û peynîye de konsensus virazîyêne. Labelê nê şeklê demokrasî yê prîmîtîvî de têna "camêrdî" est bîyî, îradeyê cinîyan û bendeyan çin bî. Polîs yan cîvîtas bi destê meclîsêko têna hemwelatîyanê camêrdan... *Dr. Îsmet Konak /R.9*

# Kurdên dilpola têk naçin

Xelkên herdu taxan bi baweriya kurdên dilpola qet nakevin, ji nivîsandina dîrokeke nû ya berxwedanê re amade ne û bi vî ruhê li gel hêzên xwe yên ewlekariyê di xetên herî pêş de bi def û zirneyê dîlana serkeftinê digerînin





Lîlav Elî

Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, herdu taxên ku tê de kurdan kurdayetiya xwe li hember celadên gelê kurd parast û bi xwîna zarokên xwe dîrokeke nû ji serhildan û berxwedanê nivîsand. Her çendî hêzên derve di serî de dijminê avakirina statuya kurdan dewleta tirk, xwestibe di şexsê van herdu taxan de kurdan di nav pencên siyasetên xwe yên qirkirinê de bifetsîne jî, gel biryara 'ev qad qada me ye û yan serkeftin yan jî mirin' di rûyê van hêzan de berz kir.

Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li bajarê Helebê di dirêjahiya şerê Sûriyeyê de ji taxên herî zêde ku rastî binpêkirinên mafên mirovan ên Rêjîma Bassê ya hilweşiyayî û Hikûmeta Veguhêz a Sûriyeyê û çeteyên Tirkiyeyê hatiye. Ji serdema rêjîma ketî heta bi hatina hikûmeta veguhêz re jî ev tax hema hema di bin dorpêçkirina mayînde de mane, lê tevî van binpêkirinan jî ev tax roleke girîng di teşekirina nasnameya berxwedana Sûriyeyê de ya bi ruhê şerê gelê şoreşgerî, têkoşîna li dijî polîtîkayên înkarkirina sîstematîk, bidestxistina mafên jinan û misogerkirina rola jinan a di nav civakê de lîstiye.

Çawa ku kurdan di aloziya Sûriyeyê de ji bo nasnameya xwe diyar kir û weke her netew û pêkhateyekê bi rengê xwe bijîn, xeta sêyemîn hilbijart, dîroka vê nimûneyê careke din li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê xwe dubare kirin. Di 1ê nîsana 2025an de Meclisa Sivîl a taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê û şandeya desthilata Şamê ya ku ji aliyê seroketiya desthilata Şamê ve hatibû erkdarkirin, li ser rewşa herdu taxan peymanek îmze kirin.

Peyman encamek ji peymana ku li Şamê di navbera Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û desthilata Şamê de hatibû îmzekirin bû. Ji xalên di peymanê ew e bû rêzgirtin ji xweserî û taybetmendiyên herdu taxan re were girtin û Hêzên Ewlekariya Hundirîn û hêzên ewlekariyê yên hikûmetê di ber parastina jiyana xelkên taxê de berpirsiyar bin. Lê ev peyman û xweseriya herdu taxan li xweşiya Dewleta Tirk ku dixwaze di bin navê HTŞê de dagirkeriya xwe li Sûriyeyê mayinde bike, nehat.

Tevî agirbesta di navbera Taxên Şêxmeqsûd û Şamê de hatiye ragihandin de jî, êvara 6ê cotmehê herdu tax rastî êrîşeke çeteyên di bin kontrola Dewleta Tirk de hatin. Pirs li vir e. Gelo ev êrîş ji berjewendiyên kîjan alî re ye?

Ev pirs ji bo her kesê ku niha li taxê dijîn zelal bûye, ew jî Tirkiye ye.

Di demekê de ku Tirkiyeyê û Sûriyeyê têkiliyên xwe li ser hesabê qirkirina gelan û sînordarkirina hebûna kurd li Sûriyeyê xurt dikin, êrîş li dijî herdu taxan pêk hat. Bi salan e Tirkiye li dijî her cure rêveberiya xweser an jî rêveberiya demokratîk li deverên weke Şêxmeqsûd û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derketiye. Tirkiye Rêveberiya Xweser ji bû hebûna xwe li Sûriyeyê wekî metirsî dibîne û bi idîaya ku hebûna rêveberiyê 'parçekirina Sûriyeyê ye' dixwaze rê li ber pêşerojeke demokratîk a bi pêşengtiya kurdan a li Sûriyeyê bigire.

Lê di rastiyê de tirsa Tirkiyeyê ne ew ku Sûriye parçe bibe. Berovajî wê tirsa wê azadiya jinan, xweseriya gelan, demokratîkirina herêman û biserxistina berxwedana kurdan e. Bi taybet taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê modeleke zindî ya rêveberiya xweser a sivîl û civakî di nav bajarekî navendî ya Sûriyeyê de temsîl dike û bi berxwedana xwe ya ji sala 2012an heta bi berxwedana xwe ya li hember êrîşên 6ê cotmehê hişt ku hemû gel rabin ser piyan û ji bo wê bikevin seferberiyê.

Îro serkeftina herdu taxan tê wateya dubarekirina vê modela xweseriyê li bajarên din ên Sûriyeyê, ev jî ne li hesabê HTŞê û ne jî li hesabê Tirkiyeyê tê. Ji ber ku jiyana li vir ji bo berdewamiya desthilata wan xetereyan ava dike. Êrîşên ku pêk hatin rasterast peymana 10ê adarê ya di navbera HSD û Şamê de têk dibe. Peymana 10ê adarê li ser prensîba hevkariyê û avakirina mekanîzmayên entegrasyon û parastina yekparçeyiya axê bû, lê tişta ku niha diqewime gumanan çêdike û dihêle ku mirov van pirsan ji xwe bike: Niyeta Şamê avakirina Sûriyeyê ye, yan hilweşandina Sûriyeyê ye, yan ji bo razîkirina Tirkiyeyê ye?

Lê tiştek heye ku divê neyê jibîrkirin û di hişê her mirovekî de zindî bimîne. Tevî bombebaran, dorpêç û hewldanên ferzkirina birçîbûnê, şêniyên herdu taxan ji helwesta xwe venegeriyan, ji ber ku bi nêrîna xelkên wê, li ser mafan danûstandin tune ye, li ser rêveberiya xweser bazarî tune ye û ji bo parastina ax û destkeftiyan paş ve gavavêtin tune ye.

Xelkên herdu taxan bi baweriya kurdên dilpola qet nakevin ji nivîsandina dîrokeke nû ya berxwedanê re amade ne û bi vî ruhî li gel hêzên xwe yên ewlekariyê di xetên herî pêş de bi def û zirneyê dîlana serkeftinê digerînin.



Mizgîn Ronak

# Tu kî yî ?



'Her kes dibêje qey tu, tu yî
Halbûkî kes nizane tu kî yî'

Hozanan tim wiha gotiye. Bi rastî jî dema ji mirov re dibêjin 'tu...' dizanin ku em kî ne?

An jî TU... kî ye? Dema em jî ji yekê/î re dibêjin TU, em dizanin ku ew kî ye? Li gor ku dixwiyê, TU muemayek mezin e, ne?

Tevî ku rutbeyek (erê heyran, çi rutbeyek mezin!), nav û nîşanek giran e jî, kes nizane TU...kî ye. Lê etîketa ku herî pir tê şixulandin jî ew e. Tew carna mirov nikare xwe bigre ji xwe re jî dibêje Tu...Ya rast ew tu, gelek caran li ber eyneyan tê bîra mirov, lê ew ne girîng e. Yanî carna TU mirov bixwe ye jî. Tew TU carna dibe TE jî. Dema wisa dibe Xweda mirov biparêze! Sûcdarkirin tên rêzkirin. Te wilo kir, divê te wilo nekira, te her tiştî xera kir, te camên heqîqetê tev anîn xwarê; te kuşt, te şûşt, te

xwar... Bi kurtasî, ji ber ku civak û welatek heta bêjî bindest ev TU çêkiriye, pirî caran li ser navê wan diaxive û dibe dadger û dadgeh ji bo xwe.

Tam li vir disekinim û li dîmenên li ser ekranê dinihêrim. Meşa Jinan a heta Enqereyê gihîşt hedefa xwe! Çi delal û zelal in jin, çi bi bawerî û hêvî, çi dilroj in jin! Bawerkirinê çi xweş dinexşînin, hêvîdarî û çelengiyê jî. Xwezî her kes û her tişt wiha bûya, dê welat û dinya çi zû pak û azad bibûya! Lê helbet dê bê ew kêlî jî, dê bê.

Îja yên ku civak û dîrokê herî pir bi TUBÛN an jî TUYÎTIYA wan lîstiye jî jin bixwe ne. Yên ku herî pir bûne kujerên xwe û bi devê pepûkan ji xwe û jinitî û mirovtî û kesayeta xwe re gotine: Te kuşt, te şûşt, te xwar (halbûkî ne kuştine, ne şûştine, ne jî xwarine) jî ew in. Lê waye li vî welatê bêmirad ew in ên ku wek stêrkan diçirisin û bi canê xwe xeyalên xwe pêk tînin. Ew, yanî jin, belkî jî cin.

***TU***

Her kes dibêje qey tu, Tu yî
Halbûkî nizanin tu kî yî

Ku bibûya tu yê biçûyayî zaroktiya xwe Desmalkên ku digirîn aş bikira
Tu, tu bûyayî

Te yê ji duduyan pênc Ji heftan jî deh derxista

***Bi firçeya lêborînê***

Cêbên xwe tije kêfxweşî bikira Û her derê rengîn...

Her kes dibêje qey tu, Tu yî
Lê nizanin tu kî yî

Li bin vî asîmanê sorgevezî Li çi digerî (Kirasê Heyvê, M. Ronak, Weş. Aram)

Îja her kes tu'yek dixwaze, her kes tu'yek diresimîne. Li gor hinekan tu ... qure yî, li gor hinekan şaş... Li gor hinekan tu 'mesafelî' yî, li gor hinekan lezgîn. Li gor hinekan tu pir baş î, li gor hinekan pir

berepaş. Ji ber ku nizanin Tu kî yî, her kes li ser serê te dibe berber û dixwaze şekil bide te. Herkes

terzî ye ji bo te û li hember te û bi meqesan dikeve ser te; vir dibre, wir dirêj dike, wir didirû, vir

dipişkivîne. Her wiha her kes hakim beg e jî. Diçe û tê ceza dide te. Hawar ji destê van berber, terzî û

hakim began, hawar ji destê hevkarî û teslîmiyeta li hember wan!

Lê Tu dîsa jî Tu be heyran û bi xwebûna xwe, van hemûyan pûç bike. Jixwe dema Tu, Tu... bî ew

nikarin tiştek bikin. Meqes û dûzan û qelemên wan ên cezaker dişkên û li wan vedigerin.

Mirovên xweşik, çeleng û wêrek, jinên dilêr, dadwer û serbilind, TU'yên rastîn û birûmet in. Loma jî dema li eyneyan dimêzînin jî, bi çavên bazan li xwe dinihêrin, ne bi yên civaka dijminên jin û jiyanê. Bi wê, eyneyan jî xweşik dikin, jiyanê jî.

Tu, Tu bî, tim azad û dilar bî.

## Rojnamegerên jin derbasî qonaxeke nû bûn

| Navenda Nûçeyan

Xelatên Rojnamegeriya Jinan a Gurbetellî Ersoz ku îsal cara yekem ji hêla Komeleya Rojnamegerên Jin ên Mezopotamyayê (MKG) ve hat lidarxistin hatin pêşkêşkirin. Rojnamegerên jin, saziyên jinan û nûnerên gelek partî û saziyên cuda di vê roja dîrokî de cihên xwe girtin.

Merasîma ku bi kelecaneke mezin hat lidarxistin bi rêzgirtina şehîdan dest pê kir. Di sînevizyona ku hat nîşandin de têkoşîna rojnamegerên jin a ku li dijî zextên heyî hatiye dayîn û biryardariya wan hat nîşandan.

Rojnamegerên ku li hev kom bûbûn biryardariya xwe ya bi salan di vê merasîmê de bi encam kirin. Elbet ev encam ne dawiyek e berovajiyê wê destpêkek nû ye. Keda bi salan a ku rojnamegerên jin li dijî hişmendiya mêrperest didin bi dayîna xelatan derbasî qonaxeke nû bû. Ev qonak qonaxa mayindekirina biryardayîn û teşedayîna civaka demokratîk e.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku Gurbetellî Ersoz nas kiribû jî ji bo vê şeva dîrokî vê peyamê şand: "Silav ji we hemûyan re. Ez vê merasîma watedar a ku îro li vir ji bo rêzgirtina Gûrbetelî Ersoz tê lidarxistin, silav dikim. Min derfet dît ku Gûrbetellî nas bikim; derbaskirina demê bi wê re, guhdarîkirina ramanên wê û şahidiya biryardariya wê ya têkoşînê şopek bêhempa li ser jiyana min hişt. Min her tim dixwest ku ez bêtir demê bi wê re derbas bikim. Jixwe noqteya herî zêde heyfa min lê tê ew e.

Min hîn jî kêliya ku min jê xatir xwest ji bîr nekiriye. Çawa ku xatirxwestina min a ji Kemal Pîr di hişê min de zindî maye, xatirxwestina min a ji Gûrbetellî jî di hiş û dilê min de dijî. Ji ber vê yekê, bîranîna Gûrbetellî ji bo me hemûyan rênîşander e.

Biryardarî, vîn û têkoşîna wê ya ji bo jiyaneke azad berpirsiyariyê li ser her kesî ferz dike. Erka me tevan e ku em bîranîna Gûrbetellî zindî bihêlin û raman û têkoşîna wê ji nifşên siberojê re veguhêzin. Îro, ez careke din wê bi rêz, bêrîkirin û hesret bi bîr tînim. Ronahiya wê rêya çapemeniya azad ronî dike.''

***Abdullah Ocalan***
***Girava Îmraliyê***

Ji bilî peyamên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gelek peyam hatin dayîn lê peyama ku ji aliyê Rêberê Gelê Kurd ve ji merasîmê re hatibû şandin coşa heyî gihand lûtkeyê.

Di yekemîn Xelatên Rojnamegeriya Jinan a Gurbetellî Ersoz de di beşa nûçeyên kurdî, tirkî û nûçeya bi dîmen de û di beşa wêne de xelat hatin dayîn. Herwiha Xelata Rûmetê jî hat dayîn.

Di kategoriya Nûçeyên Kurdî de, nûçeya nûçegihanên JinNewsê Dîlan Babat û Rojda Aydin a 'Kiryarê ku destdirêjî 12 zarokan kir, tiryakê li ku peyda dike' hêjayî xelatê hatin dîtin.

Di kategoriya Nûçeyên Tirkî de, ji Ajansa Mezopotamyayê Zeynep Dûrgût bi nûçeya 'Li Şirnexê şerê taybet: Çeteya fihûşê ya ku çawîşên pîspor jî di nav de' xelat wergirt.

Herwiha Yeşim Oruç û Necla Demir Arvas jî di kategoriya Nûçeyên Tirkî de hêjayî xelata taybet a juriyê hatin dîtin.

Di kategoriya Nûçeyên Bidîmen de ji Jinnewsê rojnameger Derya Ren bi nûçeya xwe ya bi navê; 'Bi dîmenan şideta dewletê ya li Silopyayê' xelat wergirt.

Di kategoriya wênekêşiyê de Fatoş Sarıkaya ya ji Ajansa Nûçeyan a Pîr (PIRHA) xelat wergirt.

Rojnameger Sonay Odungit jî layiqî Xelata Taybet a Juriyê hat dîtin.

Xelata Rûmetê jî ji bo Dayikên Aştiyê hat dayîn.

# 'Emşat û Hemzat hêza xwe ji Tirkiyeyê digirin'

Berpirsiyarê Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê Îbrahîm Şêxo diyar kir ku komên Emşat û Hemzat piştgiriya xwe ji Tirkiyeyê digirin û bi fermana Tirkiyeyê êrişî taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyeyê dikin

| Sosin Gulo

20ê çileya 2018an, Tirkiyeyê Efrîn dagir kir. Piştî dagirkirinê, komên El Emşat û El Hemzat li vir bi rêxistin kirin. Di rapora Komîsyona Lêkolîna Navneteweyî ya Serbixwe ya Sûriyeyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ku sala 2020an hat weşandin, hatiye belgekirin ku li Sûriyeyê, bi taybetî li herêmên wekî Efrînê ku kurd lê dijîn, koma Emşat bi fermana Ebû Emşa sûcê li dijî mirovahiyê dikin.

Hezîrana 2025an, El Emşat a girêdayî Tirkiyeyê li navçeya Şiyê ya Efrînê 3 navendên xwe çalak kirin. El Emşat di hezîranê de navendeke posta telefonê kir qerekola leşkerî û xwe birêxistin kir. El Emşat di bin serokatiya Mihemed El Casim Ebû Emşa de li navçeya Şiyê xwe birêxistin kir.

Piştî xwe li vir birêxistin kir, li dijî gelê herêmê dest bi talan, dizî, revandina mirovan kir. Bi zorê dest danîn ser zeytûnên gel. Koma Hemzat jî bêhtir xwe li navçeya Reco ya Efrînê birêxistin kir. Li gorî çavkaniyên herêmê û rêxistinên navneteweyî, Hemzat û Emşat destekê ji Tirkiyeyê digirin. Berpirsê Hemzat Sêv Ebûbekîr e. Berpirsekî leşkerî ye. Girêdayî Wezareta Parastina Sûriyeyê ye. Koma Siltan Silêman Şah jî bi navê Emşat tê naskirin. Berpirsiyarê vê komê jî Muhamet Casim Ebû Emşa ye. Girêdayî Hemayê ye. Beriya wê ev kom girêdayî hikûmeta Sûriyeyê bû. Piştî şikandina Beşar Esad û hatina HTŞê, ev kom beşdarî Wezareta Parastina Sûriyeyê bû. Cilê wan aydî ewlehiya giştî Emnel am in. Niha bi hêz û li ser piyan in. Hêzên wan li navçeyên Efrînê yên Şiyê û Raco hene. Emşat li Şiyê hene. Hemzat jî li Raco û Bilbilê ye, lê li




taxên Helebê jî hene. Herdu kom girêdayî Tirkiyeyê ne. Berpirsê Ebû Emşat, Casim Emû Emşa digot, 'Tirkiye çi ji me bixwaze em ê wê bikin. Ji ber ew parastina me dikin. Li cem me ne. Li gorî çavkaniyên herêmê Emşat û Hemzat di bin kontrola MÎTê de kar dikin.

**Fermandarên wan ji Tirkiyeyê ne**

Berpirsê Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê Îbrahîm Şêxo, têkildarî komên Emşat û Hemzat agahî dan û got: "Her çend di bin baneyê parastina giştî ya Şamê de bin jî destekê ji dewleta tirk digirin. Fermandarê wan girêdayî dewleta tirk e. Gelek caran li dijî hikûmeta Ahmet Şera derdikevin. Hemzat, li navçeyên Şiyê û Bilbilê hene. Li navçeya Şerewa û Şiyê hene. Niha komên Emşat û Hemzat li Helebê jî xwe birêxistin kirine. Li gundê Nêrebiyê û derdora gundên Şehbayê jî bi cih bûne. Parastina Sûriyeyê li Helebê cih daye wan."

**Girêdayî Tirkiyeyê ne**

Îbrahîm Şoxo da zanîn ku komên Emşat û Hemzat li Heleb, Efrîn û Şehbayê xwe birêxistin dikin û wiha axivî: "Li van bajaran bi hezaran endamên wan ên çakdar hene. Ev kom piştgiriya lojîstîk ji hikûmeta demkî ya Sûriyeyê digirin. Lê heta niha girêdayî Tirkiyeyê ne. Tirkiye piştgiriyê dide wan."

Îbrahîm Şêxo da zanîn ku li destpêka şerê li Sûriyeyê Tirkiyeyê ew hembêz kirin û di her alî de alîkarî da van koman û wiha pê de çû: "Li gel Tirkiyeyê, Qatar û Erebistan Siûdî jî piştgiriya perwerdehî û destêk da wan. Tirkiye ji bo berjewendiyên xwe dixwaze bi destê van koman her tim li Sûriyeyê aloziyê derbixe."

**Tirkiye û Qatar wan birêxistin dike**

Îbrahîm Şêxo herî dawî da zanîn ku piştî şoreşa li Sûriyeyê komên çekdar jî zêde bûn û wiha bi dawî kir: "Wê demê li herêmê DAIŞ û El Nusra derketin pêş. Lê piştî zextên dewletan li ser koman çêbûn, DAIŞ lawaz bû. Piştî wê bermahiyên DAIŞê û El Nusra navê xwe guhertin. Di bin navê 25-30 koman de xwe birêxistin kirin. Dibe ku navên wan cuda bin, lê feraset û bernameya wan yek e. Li gorî perwerdehiya Tirkiyeyê xwe birêxistin dikin û kar dikin. Yên van komên li herêmê birêxistin dikin û bi rê ve dibin dewletên li herêmê yên wekî Tirkiye û Qatar in."

# 'Azadiya kurdî di destê me de ye'

| Yilmaz Yilmaz

Saziyên zimanê kurdî û Platforma Saziyên Demokratîk dê di 15-16ê cotmehê de li Wanê bi şiara "Azadiya zimanê kurdî di destê me de ye" Komxebata Stratejî û Polîtîkayên Têkoşîna Ji Bo Kurdî li dar bixin. Bi vê komxebatê armanc dikin ku kurdî li hemû qadên jiyanê bidin jiyîn û parastina ziman mîsoger bikin.

Hevberdevkê Komîsyona Ziman, Çand û Hunerê ya DEM Partiyê Heval Dilbihar, têkildarî Komxebata Stratejî û Polîtîkayên Têkoşîna Ji Bo Kurdî ku li Wanê di 15-16ê cotmehê de pêk bînin nirxandin kir. Heval Dilbihar destnîşan kir ku navê komxebatê armanca komxebatê radixe ber çavan û wiha got: "Armanca bingehîn a vê komxebatê, di çarçoveya hişmendiya civakeke azad û neteweya demokratîk de, ji bo hemû qadên civakî û jiyanî yên li bakurê Kurdistanê, stratejî, polîtîka, nêzîkatî, helwest û bernameyên şênber ên giştî û xweser ên ji bo têkoşîn û xebatên parastin, pêşvebirin û hilberandina zimanê kurdî yên ji her milî ve diyar bike ye. Rêber Abdullah Ocalan dibêje, "Ziman ji bo neteweyekê ji nan û avê girîngtir e û kesên ku nikarin li zimanê xwe xwedî derkevin, nikarin li tu tiştî xwedî derkevin." Li ser bingeha vê heqîqeta xwebûnî, zimanê me ji bo me ji nan û avê girîngtir e."

Heval Dilbihar da zanîn ku ew lidarxistina vê komxebatê pir pêwîst dibînin, ku hemû beşên civaka kurd dê cihê xwe tê de bigirin, ji rewşa zimanê kurdî haydar bibin û li gor rist û peywira xwe, di avakirina stratejiyeke giştî ya tevahiya neteweya kurd û stratejiyeke xweser a qadên xwe de rista xwe bi cih bînin."

Heval Dilbihar, li ser amadekariya komxebatê jî agahî dan û got: "Komxebat li ser navê gelek saziyên zimanê kurdî û platforma saziyên demokratîk, ku di nav de hemû qad, partî û saziyên kurd ên demokratîk ên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê cih digirin tê lidarxistin. Ji bo meşandin û birêvebirina kar û barên komxebatê, li ser navê hemû pêkhateyên komxebatê komîteyeke amadekar bi mehane kar dikin. Di komxebatê de 8 komên sereke cih digirin. Komxebat dê du rojan, her rojekê 4 rûniştin, bi tevahî 8 rûniştin bên lidarxistin. Piştre jî hem hemû beşdarên komên din, hem jî hemû beşdarên ku li wê derê amade ne dê bi rexne, nirxandin û pêşniyazên xwe pêşkêşiyên koman berfirehtir û dewlemendtir bikin."

Heval Dilbihar li ser naveroka komxebatê jî agahî dan û wiha bi dawî kir: "Komxebata me dê li ser mijarên zimanê kurdî û stratejiya û polîtîkayên têkoşîna ji bo zimanê kurdî nîqaş bike. Dîsa di têkoşînê de têkilî, girîngî û rista jin, zarok, ciwan, çand, wêje, huner, siyaset, çapemenî, weşangerî, ekoloji, perwerdehî, tenduristî, bîr û bawerî, û rêvebiriyên xwecihî, hiqûq, dîplomasî û gelek xal û mijarên din niqaş bike."

Heval Dilbihar, herî dawî da zanîn ku ji bo pêkanîna vê jî, dê bi taybetî hewl bidin ku di encama komxebatê de mekanîzmayeke mayînde ya herî berfireh a ku ji hemû qad û pêkhateyên komxebatê pêk tê ava bikin û got: "Ji bo ku ev mekanîzma bikaribe her dem û li her derê bakurê Kurdistanê û li her derên Tirkiyeyê di asta herî jor de têkoşîna ji bo zimanê kurdî bide meşandin, dê komxebatên wiha domdar û mayînde pêk bîne."

# Biçûk û mezinan li ber xwe da

| Mehmet Alî Ertaş

Di 1ê Nîsana 2025an de Meclisa Sivîl a taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê û şandeya desthilata Şamê li ser rewşa herdu taxan peymana ji 14 xalan pêk dihat îmze kiribû. Lê piştî 160 rojan desthilata Şamê peyman bin pê kir û Heleb dorpêç kir. Piştre komên Emşat û Hemzat êrişî şêniyên taxê kir. Li dijî vê yekê gel li ber xwe da û ketin parastinê.

Li Helebê beriya 50 salan mafên kurdan û nasnameya kurdan tune bû. Ziman, çand û nasnameya kurdî qebûl nedikirin. Piştî şoreşê jî taxên Eşrefiye û Şêxmeqsûd di pêvajoyên pir zahmet re derbas bûn. Piştî şoreşê di 13 salên dawî de zarokên 7 salî heta kal û pîrên 70 salî li dijî DAIŞê li ber xwe dan û xwe parastin. Hikûmetê bi sedemên cuda zext û tundî li gel dikir. Milet pir dihat girtin. Astengî û zextên pir mezin li ser gel hebû. Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li dijî êrîşan bi sedan şehîd dan û bi sedran gazî çêbûn. Di encamê de bi ser ketin. Hemû siyaset pûç kirin.

Heleb cihê bazirganî, aborî û cihekî stratejîk e. Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê parçeyekî Helebê ye. Heta beriya peymanê hêzên girêdayî Tirkiyeyê gef li van taxan xwarin. Bi vê tifaqê heta demekê gef li ser van taxan nexwarin. Vê peymanê yekîtiya pêkhateyên taxê kûrttir kir. Şêniyên taxê di 14 salên şoreşê de xwe bi rêve birin û parastin. Heta niha nehiştine kes têkeve taxên wan.

Di peymanê de hatibû diyarkirin ku taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê piraniya şêniyên wê kurd in û ji taxên bajarê Helebê ne. Di peymanê de wiha hatibû gotin: "Hemû saziyên sivîl ên herdu taxan bi koordîneya bi saziyên sivîl ên din re dixebitin û bê ku cudahiyê bixin navbera taxên bajarê Helebê, alîkariyê didin saziyên din. Ew jî bi rêya herdu şaxên şaredariyê yên li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêk tê."

Piştî 5 meh di ser peymanê re derbas bûn, di 6ê cotmehê de komên Emşat û Hemzat ku hêza xwe ji Tirkiye û Şamê digirin taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye dorpêç kirin. Lê rastî berxwedana hêza parastinê hatin û paşve kişiyan.

Rêveberê Ofîsa Têkiliyên Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) a Helebê Mehmet Emîn Elîko anî ziman ku li Helebê bi taybetî li taxên Şêxmexsûd û Eşrefiyê hewldanên dorpêçkirinê hebû û wiha got: "Heta 7ê cotmehê taxên Eşrefiye û Şêxmeqsûd bi temamî dorpêç kirin. Rêyên çûn û hatinê girtin. Nêzî 400-500 hezar mirov li van taxan dijîn. Di van taxan de hemû pêkhateyên li Suriyeyê hene. Li dijî vê dorpêçê gel daket kolanan. Ji 7 salî heta 70 salî biçûk û mezin li dijî donpêçê daketin kolanan û nerazibûna xwe nîşan da. Di dorpêçê de hikûmeta demkî û komên girêdayî wezareta parastinê êrîşî gel kirin. Topên ji agir avêtin nava gel. Gel li dijî van êrîşan li ber xwe dan. Piştî berxwedana gel a li dijî êrîşan pêş ket, vê carê gule li ser gel reşandin."

**Gel parastina taxê kir**

Mehmet Emîn Elîko da zanîn ku komên Emşat û Hemzat piştî êrişî gel kirin, hêzên parastina hundir bersîv da û parastina gel û parastina taxê kir û wiha axivî: "Li taxê şer pêk hat. Şer nêzî 3 saetan berdewam kir. Piştre wan agirbest xwest. Gel di şer de berxwedaneke mezin nîşan da. Piştî şer komên êrîş kirin agirbest xwestin. Ji ber yên êrîş kirin di şer de şikestin. Komên êriş dikin komên Emşat û Hemzat in. Girêdayî Wezareta Hundir a Şamê ne. Lê ev kom fermanê ji Tirkiyeyê digirin. Di demên dawî de êrîş zêde kirine. Êrişî Dêr Hafir, Tişrîn û deverên din kirin. Dîsa li ser rêya Efrînê êrîşên wisa qirêj dikin."

Mehmet Emîn Elîko, da zanîn ku ev komên êrîşkar hêz û piştgiriya xwe ji Tirkiyeyê digirin û wiha pêde çû: "Ev komên çete destekê ji Tirkiyeyê digirin. Armanca van êrîşan, aramî û demokrasiya vê taxê xera bike. Li van taxan aramî, edalet, demokrasî û wekhevî heye. Dixwazin vê aramiyê xera bikin. Her tim dixwazin tevliheviyê çêkin. Karê wan êrîş û tevlihevî ye. Gel bi çûk û mezinan parastina xwe kir. Gotin 'em destûr nadin hûn derbasî taxên me bibin'."

Mehmet Elîn Elîko bal kişand ser peymana 10ê Adarê û 1ê Nîsanê û wiha lê zêde kir: "Di 1ê Nîsanê de li Helebê di navbera taxên Eşrefiye û Şêxmeqsûd û Şamê de peymana ji 14 xalan pêk dihat îmze kirin. Lê ev xal binpê kirin. Peymanan binpê dikin. Di hişmendiya wan de serdestî heye. Dibêjin 'em ê hir tiştî li gorî xwe bikin' Gelekî din û neteweyek din di nav xwe de qebûl nakin. Hişmendiya şovenîst, înkar, kuştin û qirkirina gelan bi wan re heye. Me ev hişmendî li Beravê, Şamê, Swêda û gelek cihê din dit. Ev siyaseta şoven didome."



**'Xwe neguherînin dê bên guherandin'**

Mehmet Emîn Elîko, destnîşan kir ku kesên xwe neguherînin dê bêne guherandin û wiha berdewam kir: "10 meh in bûne desthilat. Lê kuştin didome. Revandin û êrîş didomin. Ji ber vê yekê jî eger îro desthilata Şamê di siyaseta xwe de guhertinê nekin dê bêne guhertin. Em bi hêvîne. Em bi biryar in bi hevre vî welatî ava bikin. Li vir roleke mezin dikeve ser dewletên ereb û DYAyê. Divê êdî her kes li dijî vê zihniyetê derkevin û li berxwedana gel xwedî derkevin.

Mehmet Emîn Elîko bal kişand ser civîna li Şamê pêk hat û wiha bi dawî kir: "Piştî civîna di navbera şandeya HSDê û hikûmeta demkî de pêk hat, wezîrê parastinê li ser hesabê X got 'Me li hemû eniyan agirbest ragihand. Muhafisê Helebê jî li ser hesabê X got, 'em mizgîniyê didin gelê Helebê, dê rewş aram bibe û çûn û hatin dê asayî be.' Lê komên Emşat û Hemzat dijberî wê tev geriyan. Tax dorpêç kirin û li ser gel zext çêkirin. Di 9ê cotmehê de gotin, 'em ê sê deriyan vekin'. Lê dîsa erebeyan derbas nakin. Lê hewldan hene ku ji bo erebe derbas bibin. Ji bo pêwistiyên jiyanê yên wekî arvan, şîr, xwarin û vexwarin derbas bibe. Li vir nêzî 450 hezar mirov dijîn. Hejmarek gelek zêde ye. Dorpêç heye. Li dijî dorpêçê berxwedan jî heye."

## DIVÊ KOMISYON GUH BIDE ABDULLAH OCALAN

# Ji bo aştiyê azadî ferz e

■ Xecê Şen

*Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 9ê Cotmeha 1998an de ji Sûriyeyê derket û ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd li gelek welatan geriya. Lê dewletên ku nedixwestin pirsgirêka kurd çareser bibe di 15ê Sibata 1999an de Rêberê Gelê Kurd bi komployekê radestî Tirkiyeyê kirin. Ji wê rojê heta niha Rêberê Gelê Kurd li Girava Îmraliyê tê ragirtin û ji mafê hêviyê bêpar tê hiştin. Tirkiye tevî biryara DMMEyê jî naxwaze mafê hêviyê bikeve rojevê.*

*Li ser biryara mafê hêviyê yê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku Tirkiyeyê pêk neanî û Konseya Mafê Mirovan a Ewropayê jî ev biryar taloqî meha hezîrana 2026an kir, parêzvana mafê mirovan Reyhan Yalçindag Baydemir pirsên Rojnameya Xwebûnê bersivandin.*

***Mafê hêviyê tê çi wateyê û xwe dispêre kîjan dîrokê?***

Kesên ku miebeta girankirî yan jî zindankirina heta dawiya emr li wan hatiye birîn, li şûna ku heta dawiya temenê xwe di zindanê de bimînin, piştî derbasbûna demeke diyarkirî ji hêla fizîkî ve digihîjin azadiya xwe, ji vê yekê re mafê hêviyê tê gotin. Jixwe rewşa girtiyên siyasî yan jî zindanîkirina mixalifan bi xwe mijareke bi nîqaş e û di demokrasiyên hevdem de cihê vê yekê tune ye. Lewma di bin navê muebeta girankirî de wisa dikin ku girtî hema hema heta dawiya emrê xwe di zindanê de bimînin. Ev yek esasen îdamek e ku bi demê re tê kirin. Ji ber vê yekê bingeha mafê hêviyê ew mekanîzmaya hiqûqî ye ku piştî derbasbûna demeke berbiçav girtî werin berdan. Eger na, ev yek nabe muebet, dibe cezaya mirinê.

***Ji bo pêkanîna "Mafê Hêviyê" ku Konseya Ewropayê dabû Tirkiyeyê bi dawî bû û careke din dem da Tirkiyeyê, gelo çima Tirkiye mafê hêviyê pêk nayne?***

Tirkiye mafê hêviyê bi cih nayne, ev yek rasterast binpêkirina biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ye. DMMEyê di 2014an de li ser Abdullah Ocalan biryar da. Ez yek ji wan parêzeran im ku ev yek biriye DMMEyê. DMMEyê mafê hêviyê cara ewil wê demê di wê biryara xwe de nirxand û biryar da ku di cezayê muebeta girankirî ya Abdullah Ocalan de mafê berdana bi şert tune ye û şertên tenêhiştinê (tecrîd) madeya 3yemîn a peymanê binpê dike. Abdullah Ocalan hîna di bin van şert û mercan de tê girtin û tevî ku 11 sal di ser vê biryarê re derbas bûbin jî, hîna mekanîzmaya berdanê pêk nehatiye. Ev yek tê wê wateyê ku îşkence û miameleya xirab hîna berdewam dike. Wekî gelek biryarên din, Tirkiyeyê ev biryar jî



Parêzer Reyhan Yalçindag Baydemir destnîşan kir ku eger Tirkiye biryara KEyê ya mafê hêviyê pêk neyne, ev yek rasterast binpêkirina biryarên DMMEyê ye û got: "Ev yek tê wê wateyê ku îşkence û miameleya xirab berdewam dike. Li dijî makezagona xwe tev digere. Ji ber ku madeya 90î ya makezagonê dibêje ku pêkanîna biryarên DMMEyê mecbûrî ye."

pêk neanî. Esasen li dijî makezagona xwe tevdigere. Ji ber ku madeya 90î ya makezagonê dibêje ku pêkanîna biryarên DMMEyê mecbûrî ye.

Li gelek welatên cîhanê ji bo çareseriya pevçûn û şeran rêbazên taybet hatine ceribandin. Hin ji wan bi awayekî cidî serkeftî bûne û veguherîne aştiya mayinde. Ji bo ku ev pêvajoya heyî serkeftî bibe, divê biryarên DMME û Dadgeha Makezagonê werin bicihanîn û rê were vekirin ku muxalefeta kurd ku derketiye derveyî rêbaza çekdarî siyasetê bike û siyaseta demokratîk were misogerkirin. Madem aktorê sereke yê pêvajoyê birêz Ocalan e, wê demê divê bê ku dereng bibe û hêviyên aştiyê tune bibin, divê qanûnên pêwîst werin derxistin. Tenê derxistina qanûnan jî pirsgirêkê çareser nake, lewma divê rê bê vekirin ku mewzûata nû were bicihanîn. Ev mewzûat li gorî hiqûqa mafên mirovan a navneteweyî ye. Wekî din, ne rastî ye ku mirov ji kesekî hêvî bike ku pêvajoyê bi rê ve bibe ku ew kes di bin tecrîd û îzolasyonê de ye û girtîbûna wî dewam dike. Tenê carekê parêzer çûn hevdîtinê û Heyeta Îmraliyê bi awayekî sînordar bi Abdullah Ocalan re hevdîtinê dike, lewma ev yek nayê wê wateyê ku tecrîd rabûye. Çareserî ew e ku mafê hêviyê were bicihanîn ku biryara DMMEyê ya 2014an jî vê yekê dibêje.

***Divê entegrasyona demokratîk çawa pêk were? Di warê yasayî de entegrasyon dê çawa çêbibe?***

Mixalefeta kurdî ya ku derketiye derveyî rêbaza çekdarî, heta ku guherînên qanûnî neyên kirin û mewzûata entegrasyonê çênebe, ne mimkûn e ku werin siyasetê bikin. Heta niha hin hiqûqnas, rêxistinên mafên mirovan, akademîsyen û saziyên civaka sivîl gelek pêşniyar ji komîsyonê re pêşkêş kirin. Dengê wan esasen dengê kolanan û dengê wan kesan e ku di 52 salên dawî de li Tirkiyeyê ji pevçûnan bandor kirine. Dema ku li wî dengî binêrin, dê were dîtin ku tişta pêwîst, tişta ku divê ewil were kirin û tişta lezgîn guherandina mewzûata qanûnî ye û li meclisê derxistina qanûnên beşdarbûna demokratîk e. Lê mixabin tevî ku bendewariya civakê evqas zêde ye, girtiyên nexweş jî nayên berdan; tevî ku dema xwe ya girtîbûnê çend sal berê temam kiribin jî, gelek girtiyên siyasî bi awayekî kêfî ji azadiya xwe bêpar tên hiştin.

***Ji bo pêşketina 'Aştî û Civaka Demokratîk' astengiyên yasayî çi ne û lazim e ev astengî çawa bên derbaskirin?***

Me di pêvajoya çareseriyê ya berî niha de jî gelek caran anîbû ziman, heta ku pêvajo bi qanûnan neyê piştgirîkirin, ne mimkûn e ku bigihîje encamê. Avakirina komîsyonekê di bin banê meclisê di gaveke girîng bû, lê belê xuya ye ku ev yek ne bes e. Heta me dît ku tehemul nekirin ku Dayikên Aştiyê xwe bi zimanê xwe îfade bikin. Tiştekî hêja ye ku hin beşên civakê heta radeyeke sînordar fikrên xwe anîn ziman, lê belê rêxistinên jinan, saziyên ciwanan, tevgerên ekolojiyê û kesên ku ji şer û wêrankariyê zerar dîtine, nehatin guhdarkirin. Lewma divê ev beş jî werin guhdarkirin, divê ne tenê guhdar bikin, her wiha çawa ku meclis vebibe, divê pêşniyar bibin qanûn. Eger na, ev yek mayinde nabe. Ji bo ku mayinde bibe, divê mewzûateke qanûnî ya nû were çêkirin ku giştgir be û bingeha wê xurt be.

Divê neyê jibîrkirin ku ev pirsgirêk hevtemenê komarê ye. Komarek ku leşkeran ava kiribe û zihniyeta mîlîtarîst şekil dabe wê, ne mimkûn e ku mirov di wê de li hêviya atmosfereke wisa be ku rêzê li azadiyên sivîl û demokratîk bigire. Zihniyeteke wisa ye ku ji destpêkê ve nehiştiye ku gelên li Tirkiyeyê bi zimanê xwe yê dayikê, bi reng û bawerî û nasnameya xwe bijîn; kesên ku ne tirk û sunî bin, cudakarî li hember wan kiriye. Ji ber vê yekê yek ji astengiyên li pêşiya pêşveçûna civaka demokratîk makezagona heyî ye ku berhema cûntayeke leşkerî ye. Pergaleke ku cihêrengiyan tune bihesibîne, wan yekreng bibîne û xwe bi metafora 'yek ziman, yek dîn, yek milet' bîne ziman, ne mimkûn e ku di wê de civaka demokratîk pêk were. Civaka demokratîk berî her tiştî civakeke wisa ye ku xwe di ewlehiyê de hîs dike, bi nasnameya xwe li ser rasteqîn û bi awayekî azad xwe li ser pêyan digire û mafên xwe yên zikmakî di bin misogeriya qanûnan de dibîne.

***Girîngiya azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ji bo pêvajoyê divê ji aliyê hikûmetê ve çawa bê nirxandin û komîsyon çawa tevbigere?***

Esasen divê mirov vê pirsê ji desthilatdariyê û şirîkê wê bipirse. Pêvajo bi Ocalan re tê meşandin û careke din derket ku ew tekane kes e ku dikare çekan derxe derveyî rêbazê. Lewma dewlet heta ku azadiya Abdullah Ocalan pêk neyne, dê vê pêvajoyê çawa bimeşîne? Berî her tiştî ev yek di heman demê de testeke samîmiyetê ye jî. Li aliyekî dê behsa rêberiya avakar a birêz Ocalan were kirin, lê li aliyê din jî dê şert û mercên wekhev neyên pêkanîn û hîna jî di bin tecrîdê de be. Li tu dereke dinyayê nêrîneke wiha serkeftin neaniye û rê li ber çareseriya mayinde venekiriye. Lewma rastîbûna aştiyê ku bi qasî nan û avê pêwîstiya mirovan pê heye, di wê yekê re derbas dibe ku rêveberê wê bikare bi awayekî azad xebatên xwe bimeşîne. Heta niha komîsyonê Abdullah Ocalan guhdar nekiriye, ev yek jî têra xwe rewşeke biproblem e. Divê komîsyon demildest guh bide fikrên Ocalan jî û mîsyona xwe bimeşîne.

***Herî dawî di çarçoveya pirsên me û tabloya ku te derxistiye holê li ser pêvajoyê tu dikare çi bêjî?***

Biryareke DMMEyê li ser mafê hêviyê heye û li gorî madeya 90î ya makezagonê ev biryar girêder e û nîhaî ye. Eger neyê bicihanîn, mueyîdeyên Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê dikevin meriyetê. Komîte çend roj berî niha civiya û rexne li Tirkiyeyê kir ku Tirkiye heta niha tedbîrên qanûnî negirtine û bang li Tirkiyeyê kir ku divê di vê mijarê de bi awayekî lezgîn gavan biavêje. Berî rûniştina Komîteya Wezîran, dema ku em li pêşkêşiyên nivîskî yên saziyên navneteweyî yên wekî TLSP, ELDH, MAF-DADê dinêrin, em dibînin ku komîteyê di biryara xwe de cih daye nêrînên wan. Di rûniştinên berê de jî saziyên hiqûq û mafên mirovan ên wekî IHD, FIDH û TLSPyê pêşkêşiyên xwe yên nivîskî pêşkêş kirin û diyar kirin ku ew ê şopdarê bicihanîna biryara DMMEyê bin. Komîteyê di biryara xwe ya meha îlonê de daxwaza avakirina mekanîzmayeke qanûnî kir ku rê li ber serbestberdanê vedike. Heta ku ev biryar were bicihanîn, divê rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî hewldanên xwe yên li ba Komîteyê bidomînin.

Ji nifşa min îro gelek kes ne li jiyanê ne, ev yek ji bo min gelek tiştan îfade dike. Qonaxeke wisa ye ku 52 sal in bênavber dewam dike. Dewletê di salên ewil de xwe ji gotina 'şer' dûr girt, lê paşê dem bi dem jê re got 'şerê astnizm'. Êşên vê qonaxê, wêrankarî û windahiyên wê hîna li holê dimînin. Min temamê jiyana xwe ya kar bi vekirina gorên komî, bi ronîkirina kuştiyên ku kiryarên wan tên veşartin û bi pirsîna kiryarên gundên şewitandî derbas kir. Wek hiqûqnasekê divê bibêjim ku yek ji lingên aştiyeke rastî û birûmet jî 'edaleta dema veguhêz' e. Heta ku edalet pêk neyê, rûbirûbûn çênebe, heta ku kiryarên sûcên li dijî mirovahiyê neyên derxistin, yanî heta ku rastî bi hemû aliyên xwe ve neyê derxistin, ne mimkûn e ku aştî pêk were. Ji ber ku aştî ne tenê ew tişt e ku çek neteqin. Aştiya rastî, aştiyeke birûmet tenê û tenê bi misogerkirina mafên kurdan, bi makezagoneke demokratîk, bi mewzûateke qanûnî ya demokratîk û bi derketina heqîqetan pêk tê.



## Reyhan Yalçindag Baydemîr kî ye?

Di sala 1974an de li Amedê hatiye dinyayê û di sala 1991ê de dest bi fakulteya hiqûqê ya Zanîngeha Enqereyê kiriye. Ji ber şert û mercên giran ên salên 1990î xwestiye ku di qada mafên mirovan de bixebite. Rêveberiya Şaxa IHDyê ya Amedê û rêveberiya navenda giştî û serokatiya giştî kir. Di avakirina TOHAVê de cih girtiye. Ew yek ji wan hiqûqnasan e ku li ser navê IHDyê bi dildarî gelek bûyer birine DMME û Neteweyên Yekbûyî cih girtiye. Di nav van bûyeran de kuştiyên ku kiryarên wan tên veşartin, gorên komî, kuştiyên ku di wexta binçavkirinê de çêbûne, şewitandin û valakirina gundan, îşkenceya cinsî û fizîkî ku di binçavkirinê de çêbûne ku hê jî dodomin, di asya navneteweyî de eleqeder dibe.

# 'Rêwîtiya dengbêjekî ermen'

## Dengbêjê nemir Gerabêtê Xaço, şahidê dîrokê ye. Kokên wî yên ermen û girêdana wî ya kûr bi muzîka Kurdî re sembolek bihêz di navbera nasnameyan û bîra kolektîf de ye



Arslan Ozdemir



*"Dengê Gerabêtê Xaço bîranînek e ku êşa gel vediguherîne stranan û êşê vediguherîne hêviyê."*

Dema ku ez zarok bûm, dengê ku bi kûrî ket nav dilê min, di nav dengên biçizeçiz ên Radyoya Êrîwanê de, dengê Gerabêtê Xaço bû. Dema ku ez li ber radyoyê rûdiniştim û min guh dida stranên wî, ne tenê stranek, lê êş, şahî û berxwedanên sedsalan li ber guhê min diçirisîn. Di wan kêliyan de, min hestek kûr hîs dikir ku min nikarîbû bi tevahî fam bikira, lê şopek kûr li ser dilê min dihişt: rabirdû û niha, windahî û hêvî, nasnameya ermen û çanda kurdî, bi dengê wî dibûn yek.

Paşê ez hîn bûm ku Gerabêtê Xaço dengbêjek bû, ku yek ji kesayetên herî bihêz ên kevneşopiya muzîka kurdî tê hesibandin, dengbêjek bû ku tevî eslê xwe yê ermen, hemû berhemên xwe bi kurdî pêşkêş dikirin. Xaço, hem hunermend û hem jî şahidê dîrokî bû, di sedsala 20an de ji bo nîşandana nakokiyên nasnameyî, koçberî, hevpariyên çandî û şêweyên berxwedanê. Ew li Mezopotamyayê mînakek girîng bû. Muzîka Xaço, ku kevneşopiya dengbêjiyê wekî dîroka devkî zindî dihêle û wê ji nifşên pêşerojê re vediguhezîne, hem wekî pirek û hem jî wekî bîranînekê xizmet dike.

Xaço, sala 1903yan, li gundê Bileydera Êlihê ji dayik bû. Sala 1915an, di dema Qirkirina Ermenan de, wî şahidiya hilweşandina gundê xwe kir. Ew û xwişk û birayên wî Abraham, Manûşak û Xezal bi saya leşkerekî kurd sax man. Wî 15 salan li Qamişloyê li Lejyona Fransî xizmet kir. Sala 1936an, dema ku li Qamişloyê bi lejyonê re xizmet dikir, bi Yeva, bi keça malbata Azîzan re zewicî. Çar keç û kurek wî çêbûn. Sala 1946an, ew bi malbata xwe re koçî Ermenistanê kir û li Êrîwanê bi cih bû.

Ew bi salan di beşa weşana bi zimanê kurdî ya Radyoya Êrîwanê de xebitî. Ev serdem hem ji bo tomarkirina muzîka kurdî û hem jî ji bo dîtina nasnameya kurdî ya giştî girîng bû. Bi rêya radyoyê, Xaço gihîşt girseyeke fireh a temaşevanan û piştrast kir ku kevneşopiya dengbêjiyê ne tenê li meydanên gundan, lê di heman demê de divê bi rêbazên ragihandinê yên nûjen bê veguhastin.

Radyoya Êrêwanê di nîvê sedsala 20an de, ji bo muzîka kurdî wekî "arşîveke nûjen" xizmet kir. Di vê çarçoveyê de, berhemên ku Gerabêtê Xaço pêşkêş kirin ne tenê hunerî bûn, her wiha beşek ji têkoşîna nasnameyê bûn. Wî stranên kevneşopî yên wekî "Ay lo mîro", "Edûlê", "Çûme Cizîrê", "Ximximê", û "Lê lê dayikê" pêşkêş kirin. Ew di 15ê Çileya 2005an de, li Ermenistanê çû ser dilovaniya xwe.

Stranên Xaço ne tenê veguhestinek muzîkî ne; ew di heman demê de celebek ji nû ve hilberandina bîra civakî û berxwedana çandî ne. Dengê Xaço ji bo gelê kurd wekî arşîveke kolektîf xizmet kiriye.

Nasnameya Gerabêtê Xaço ji hêla sosyolojîk ve balkêş e. Ji aliyekî ve, ew çîroka zindîmana zarokekî ermen e û ji aliyê din ve, ew pêşxistina hesta aîdiyeta wî bi çanda kurdî re ye. Ev nîşan dide ku nasnameyên etnîk û çandî ne mutleq in, lê belê avahiyên pirjimar û derbasdar in ku ji hêla şert û mercên dîrokî ve hatine şekildan. Xaço bû pirek di navbera kokên xwe yên ermen û çanda kurdî de, û di bîranînên her du gelan de şopek mayînde hişt.

***Jiyan û muzîka Gerabêtê Xaço ji gelek aliyan ve girîng in:***


- Stranên wî ezmûnên dîrokî yên gelê kurd zindî hiştin.

- Wî li dijî zexta neteweyî û polîtîkayên asîmîlasyonê qadeke berxwedana çandî afirand.

- Xaço nîşan da ku nasnameyên etnîk ne sabît in lê bi têkiliyên çandî ji nû ve tên şekildan.

- Çalakiyên wî li Êrîwanê mînakek hebûna diyasporaya kurd bi rêya hilberîna çandî ne.

***Gerabêtê Xaço ne tenê dengbêjek e; ew di heman demê de şahidê dîrokê ye. Kokên wî yên ermen û girêdana wî ya kûr bi muzîka kurdî re sembolek bihêz e di navbera nasnameyan û bîra kolektîf de. Xaço ne tenê stran, lê di heman demê de bîranîn, êş û berxwedana gelekî jî li pey xwe hişt. Îro roj, stranên wî wekî mîrateyeke hevpar ji bo gelê kurd û ermen dijîn.***



Delav
Feratê Dengizî

# Ma ax ji me bawer e!

Ka li binê vî ezmanî, na wele li vê gerdûnê kê yan çi wate daye hebûnê. Kî, çi me tevan û her tiştî distrîne di pêxila xwe de. Belkî gerdûnê ew an jî wê gerdûn bi avakirina xwe, xwe abadîn kir. Ku ne ax bûya, wê çi wateya hebûn, zeman, jiyan an jî gerdûnê. Nizanim, belkî hûn jî nizanin.

Temam av her tiştî diafirîne, lê kî, çi her tiştî dihewîne?

Hewa û agir bila dilê xwe negirin. Rastî jî "em ji axê hatine em ê herin axê."

Lê ax, ax... ma kî ne di dilê wê de, ne di pêxila wê de ye!

Em pê li ku kin, qêrîn û hawarek nebihîstî heye hûn dizanin! Belê her kes nabihîse, lê yên ku dibihîsin hene û wijdanê wan radibe qapanê, dinivîsin, dilorînin, diqîrin, weke Hogir Berbir ku Xendeka Biloka nexşandiye û qîrîna axê gihandiye dil û mejiyên me.

Belê, êdî ev ax mîna Gora Komî ye. Ev rehên me ne û em bi wan, bi xêra wan dijîn û ji ked, xwêdan û xwîna wan xwedî dibin.

Hîn reşewrên Duwazdehê Îlonê ango rezbera hezar û nehsed û heştêyî bi ser me de kon venegirtibû. Ewrên giran li ser jiyana me diçûn û dihatin. Li Stasyona Mêrdînê li lojmana mamosteyan dimam û apê min mêvanê me bû. Wek her carê êvarê dîsa eletrîk çû û em man di tariyê de. Me lembeya don a kevnare pêxist, bêhna don em sergêj kirin. Apê min ji Qezê-Qoserê hatibû, nîvheyirî dipeyivî. "Lawo karekî min li Qezê hebû, dereng mam. Lê min tiştin bihîstin wele hişê min sekinî. Dibê telebe li Blokan bi eskeran re ketine şer, yek navê wî Kazim Xoce ye, çi ye. Dibê heta dawiyê şer kiriye, ku fîşekên wî qediyane, tivinga xwe şikandiye, bangî eskeran kiriye, nêzîkî nîvsaetî peyiviye. Esker şaş mane. Lê şer e, ku diçin ser cenazê wî hurmetê didinê. Xelk wiha dipeyive gelo ev çi ye?"

Tiştek ji dilê min qurifî û heta sibehê hişê min nehat serê min.

Lê va Hogiro nivîsiye. Wexta min xwend guvaştina dil, heyranî û pêşveçûna lêgerîna azadiyê dilê min haş kir. Belê va ev xak dipeyive.

Çend rêzan ji pirtûkê parve bikim û berdewam bila ya dilê we be. Destxweş û her dilê te rohnî be Hogirê hêja ku van rûpelan li wêjeya şoreşê zêdebûn.

"Şêrzan ji kêfan êdî nizanibû dê çi bike, ji dilgermî û wêrektiya şervanan û coşa gel re êdî destê wî nema ji wan qetiya, berê xwe da Kazim Xoce û got:

'Hevalê Xoce, tu Xocê kîjan camiyê yî, ez jî dixwazim bêm wê camiyê û tev li cimaeta we bibim.'

Pêşî her kes şaşwaz bû, paşê pixînî bi tevan ket û keniyan. Şêrzan ji kenê wan tiştek fahm nekiribû û bi awayekî şikestî li benda axaftina Kazim Xoce bû; xwe negirt û got:

'Heval min tiştekî xerab negot?..'

Kazim Xoce destê xwe danî ser milê wî, hinekî firkand û bi ken.."(Rp.37)

"Sohbeta wan bi henekan wiha berdewam kir. Silê Remo sifreya xwarinê li ber wan raxistibû, li ser sifreyê jî henekên xwe bi hev re dikirin û ken ji ser lêvên xwe kêm nedikirin.

Bêhna çiyê bi bayê ku diket hundir, xwe berî nav difnên wan dida û dêhna dilan bi afûr û kafûrê xweş dikir. Carinan bêhna sergînê di axuran de jî xwe dilivand û di qorziyên şibakê û deriyan re derbasî nav difnên wan dikirin. Bêhnek nexweş be jî bi bayê re dikişandin hundirê xwe.

Hişê wan, tevger û armanca wan, raz û birdoziya wan li ser dinyayeke wan a din bû. Ev dinya ji armanc û rêzikên hebûna wan pêk dihat û xala bingehîn bû ku dest li ser nedihat dayîn. Çi xêzik û razên dinyayî hebûn, ji tevgerîna xelasiya ajoyên kesayetî wêdetir, tevî aşopan li ser riya zanebûn û şiyabûna netewîtiyê dikirin bîr û bawerî û li pey wê diçûn." (Rp.67)


Pirtûk xweş û bi zimanekî herikbar hatiye nivîsin. Heq heye ku van lehengan û ew roj neyên jibîrkirin; ew rojên giran, bargiran bêne nivîsîn û bibin para wêjeyê, çi bi roman, kurteçîrok, helbest, bîranîn û hwd. Bîra me divê nebe para biyaniyan, bibe hebûn, jiyan û rastiya civaka me. Niha ev qelsî heye û nivîskar wêrekiyek, ligel kêmasiyan, daniye holê. Ez dibêjim ev karekî ne ji rêzê ye. Ji bo fêhmkirina niha, fêhmkirina rabirdûye asas e ku em dahatûya xwe rohnî û tekûz bikin. Divê hestên cangoriyan bêne zanîn. Helbet divê hunersazî û hûnandin li pêş be, ne rijî. Em deyndar in, deyindarên axa xwe ne ku ji me bawer be. Gelo ma axa me ji me bawer e! Bersiva vê pirsê dengê wijdanê ye.

Dibêjim nivîsa xwe bi helbestek rêzdar E. Pêşew biqedînim ku têklidarî rastiya dilê me û romanê ye;

*"Leşkerê Wenda*
*dema şandeyeke biyanî tê welatekî,*
*tacgulekê dibin ser gora*
*şervanê winda.*
*ger sibê*
*şandiyeke biyanî were welatê min*
*û ji min bipirse: ka gora*
*şervanê winda?*
*ez ê bibêjim: ezbenî,*
*li berava her coyê*
*li ser doşkê her mizgeftê*
*li ber deriyê her dêrê*
*her şikeftê,*
*li ser kevirê zinarê her çiyayî*
*li çiqê her dara daristanê*
*li kurdistanê*
*li her bosta axê*
*li her geza esman...*
*xem nake, piçekî xwe bitewîne*
*û tacgula xwe lê deyne."*

Xaka zêrîn xweşmala me ye ku me hindik berdêl nedayê!

------
Xendeka Biloka
Gora Komî
Hogir Berbir
Roman
114 rûpel
Weşanxana Aram-2024
------
Bi hêviya xwendinê.






Kamran Simo Hedilî

# Wêje

Peyva wêje ji gotina ´´bêje´´ hatiye. Ereb jê re edeb an jî edebiyat dibêjin. Latînî jê re lîteratur dibêjin.

Ji hunera bûyeran, raman, hest û xeyalan bi awayekî spehî (estetîkî) bi rêya ziman hatî derbirînkirin re wêje tê gotin.

Wêjevan, an wêjenivîs her dem dixwazin tenêtî, evîn, keder, tengasî, nefret, hezkirin, hest û xeyalên mirov bidine nasandin. Ji ber mijara wêjeyê mirov û jiyan e. Dixwazin aliyên mirov ên baş û nebaş, rast û şaş, rind û xirab derxîne holê.

Heta ji wêjenivîsan tê hevpariya çarenivîs û giyanên mirovan îzah dikin. Wan bi hev didin naskirin û wêjeya xwe dikine amûra hevnaskirina wan. Bi vê xisletê wêje cîhanî ye. Lê nayê wê wateyê cudatî di navbera wêjeyên civak û netewan de tune ye. Her gel li gorî jiyana xwe ya civakî, aborî û siyasî çand û wêjeya xwe diafirîne.

Wêjehez bi riya rêkûpêkkirin û xweşiykirina peyvan derd, kul, keser, şadî û xweşiyên xwe tîne ziman. Raman, hêvî û xeyalên xwe bi peyvên spehî dixemlînin û pêşkêş dikin.

Wêje ne tenê tiştên hatine nivisîn. Lê belê her wiha ji tiştên nenivisî re jî wêje tê gotin. Wêjeya nivîsandî û wêjeya devkî, dibin du beş.

Li nav gelek gelên hê jî negihiştine serxwebûna xwe, wêjeya devkî li pêşiya wêjeya nivîsandî ye. Wêjeya hemû gelên cîhanê bi wêjeya devkî destpêkiriye û piştre hatiye nivîsandin.

Bi guhartin û xwenûkirina jiyana mirov û netewan re wêje jî formê nû digire û xwe nû dike. Ez dikarim bêjim wêjeya netewan neynika (awêna) netew û gelan e. Weke mînak mirov di gelek sitranên sedsalên bihurî yên kurdan de evîna di navbera evîndarên olcuda de dibîne. Mirov di nav sitran û çîrokên wê demê de dibînê gelên cuda li Kurdistanê bi hev re jiyane û têkiliyên wan ên civakî bi hev re hebûne. Van têkiliyan kiriye ku ciwanên olcuda bûbûna evîndarên hev. Mînak sitrana Matran Îsa, ya evîna Meyrema xiristiyan û Elî yê misilman tîne ziman. Ya din Derwêş Evdî yê êzdî û Edula misilman. An jî sitrana Kirîvo ya evîna keçika êzdî û kurikê misilman tîne ziman. Weke van sitranan bi dehan sitran hene jiyana hevbêş ya kurd, sûryan, ermenî, misilman, êzdî, sûnî û elewiyan nîşanî me dikin.

Tiştekî dinê îro em li nav wêjeya kurdî nabînin, ew e, sitran û çîrokên bi giranî şerên êlan anîne ziman in. Ew sitran li ser şerên êl û bavikan e, li ser şerên xal û xwarzêyan e, yên li ser şerên hevşêlandin û rêbirîna hev, em îro wan nabihîzin.

Em li sirûda kurdan ya netewî Ey Raqîb binêrin, em ê baştir xwenûkirin û guhêrîna wêjeyê bibînin.

´´Ey reqîb her maye qewmê Kurdziman
Naşikê û danayê topê zeman.
Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin.
Jîn dibin, qet nakeve ala kurdan.´´

Wê demê helbestvanê hêja Dildar li zindanê ye û Ey Reqîb li zindanê dinivîse. Ey Raqîb heta roja me weke sirûdê netewî hatiye. Ji gotinên sirûdê tê fêhmkirin, neyarên kurdan xwestina wan tune bikin û kurdan jî, ji bona nemirin li ber xwe dane.

´´Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin.
Jîn dibin, qet nakeve ala kurdan.´´

Dildar helbestvanê netewî, lewaziya kurdan ya wê rojê bi van gotanan tîne ziman. Ez bawer dikim heke îro sirûda kurdan hatibûna nivîsandin, Dildar dê negotibûna, ´´kes nebê kurd dimirin.´´ Dê gotibûna, ´´kes nebê kurd dê bêazadî bijîn, dê azad bihêje ala kurdan.´´ Ji ber kurdan kefenê mirinê dirandin û îro serkêşiya azadiyê di herêma xwe de dikin. Kurd ji wêjeya mirinê, derbasî wêjeya azadî û serkêşiyê bûne.

Dîsa sitranên kurdan ên nû, ne li ser lehengên şerên nav xwe ne. Li ser rizgarî û azadiyê, helbest, sitran, çîrok û romanên kurdan têne nivîsandin. Xwenûkirin û guhêrîna wêjeyê bi jiyana gel û netewan re di wêjeya kurdan de gelekî vekirî xuya dike.

Heke îro dengbêjekî/ê kurd rabe û sitranekê li ser şerê hevkuştina êlan bisitirê, kêm kes dê lê guhdarî bikin û gelek kes dê pê bikenin.

Wêjevan wênekêşên dema xwe ne û wêje jî neynika dema hatî gotin, an hatî nivîsandin e.

# Nîqaşên siyasî, êrîş û destwerdanên navneteweyî

Geşedanên li herêmê nîşan didin ku Sûriyeya nû hîn jî di navbera hêvî û krîzê de ye. Yekîtiya siyasî, parastina mafên gelê kurd û hemû pêkhateyên herêmê ji bo pêşeroja Sûriyeya yekgirtî û nenavendî xwedî girîngiyek mezin e



Xweşkanî
Felemez Ulug



Nûnerê taybet ê serokê Amarîkayê Donald Trump Tom Barrack û fermandarê CENTCOMê Admiral Brad Cooper, 6ê cotmeha 2025an, li rojhilatê Sûriyeyê bi fermandarê giştî yê HSDê Mazlûm Ebdî û hevseroka Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Îlham Ehmed re civiyan. Li gorî daxuyaniya Barrack, mijarên civînê “nîqaşên kûr” li ser yekîtiya Sûriyeyê, parastina li dijî DAIŞê û pêkanîna peymana 10ê adarê bûn.

Piştî vê civînê, hêzên ewlehiyê yên Hikûmeta Demkî ya Şamê hemû rêyên ku diçin taxên bajarê Helebê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê girtin. Ev tax, ku zêdetirî 100 hezar kurd lê dijîn, li gorî peymana entegrasyonê ya bi hikûmeta Şamê re ji adara 2025an ve di bin kontrola hêzên ewlekariya hindurîn de ne. Lê belê, ev girtina rêyan bû sedema protestoyên mezin ên niştecihan, ku daxwaz li ser vekirina rêyan û parastina mafên xwe kirin. Lê çeteyên girêdayî hikûmeta demkî bi çekên giran êrîşî gel kirin. Li gorî raporan, di van êrîşan de du welatî şehîd bûn û zêdetirî 60 welatî jî birîndar bûn.

Bêguman ev êrîş ne netê li dijî kurdan, li dijî pêkvejiyana gelan pêk hat. Hişmendiyên ku bi zihniyeta dagirkerî û talanê hatiye ser deshilatê, ne mimkûn e ku li gorî rastiya civakî û çandî nêzî xelkê herêmê bibe. Lewma êrîşa 6ê cotmehê ji êrîşek çekdarî wêdetir, êrîşek li ser pêkvejiyana gelan bû. Li ser nerazîbûn û bersivdayîna xelkê herêmê di 7ê cotmehê de, agahiya rawestandina şer hat ragihandin, lê rewş hîn jî krîtîk e.

Mirov nikara van êrîşan ji hebûna dewleta tirk a li herêmê cudatir bigire dest. Ji adara 2025an ve, nîqaş di navbera Hikûmeta Demkî ya Şamê û Rêveberiya Xweser de li ser mijarên wekî entegrasyona leşkerî, kontrola sînoran, balafiran û qadên neftê û gazê tên kirin. Peymana 10ê adarê armanc dike ku HSD di dawiya 2025an de bibe parçeyeke artêşa Sûriyeyê. Lê belê, ev nîqaş ji ber destwerdanên Tirkiyeyê bê encam dimînin. Tirkiye li şûna ku HSDê weke temînata parastina xelkê herêmê bibîne, wê ji bo xwe wekî gef dibîne. Ji ber van tirs û xofên dewleta tirk tê xwestin ku HSD ji mîsyona xwe dûr were xistin. Lê hemû kesên ku herêmê nas dikin û li ser xwedî fikir in, bi girîngiya HSDê dizanin. Yanî dewleta tirk bi senaryoyên çêkirî hewl dide ku rastiyan berovajî bike, xelkê herêmê bêparastin bihêle.

Li gorî analîzan ev destwerdanên dewleta tirk, rêveberiya Şamê li dijî gelê kurd teşwîqî êrîşan dike. Tîrmeha 2025an, nîqaşên li Parîsê hatin betalkirin û ji tebaxê vir ve êrîşên li ser Der-Hafir, bendava Tişrînê û deverên din nîşaneya vê yekê ne. Her çend di navbera Rêveberiya Xweser û Hikûmeta Demkî ya Şamê de li ser agirbestekê lihevkirine hatibe ragihandin jî dewleta tirk nahêle li herêmê aramî pêk were. Lewma piştî hevdîtina li Şamê Wezîrê Karê Derve yê Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê Esad Hesen Şeybanî ji vê armancê cuda nîne.

8ê cotmehê, Wezîrê Karê Derve yê Şamê Esad Hasan Şeybanî çû Enqereyê û bi Wezîrê Derve yê Tirk Hakan Fîdan re civiya. Sedema sereke ya vê serdanê, li gorî daxuyaniyan, “xurtkirina têkiliyên di navbera aliyan de, aramiya herêmî û pêkanîna peymana entegrasyona HSDê” bû. Şeybanî yê ku beriya çendekî bi nûnerên Rêveberiya Xweser û HSDê re civiyabû, meseleya navxweyî derxist derveyî welat û bi HSDê “hêdîbûnê” tawanbar kir û got ku “ev nîqaş tenê li ser kaxezê man”. Ev gotina Şeybanî bi dilê Wezîrê Karê Derve yê Dewleta Tirk Hakan Fîdan bû ku wekî rêveberekî mudaxeleyî karê navxweyî yê Sûriyeyê dike. Careke din derket holê ku reveberiya demkî ya Şamê ne xwedî wê îradeyê ye ku bi îradeya xwe biryaran bigire. Hêzên ku ew aniye ser deshilatê îro siyaseta Şamê diyar dikin.


Di çarçoveya van geşedanan de, helwest û siyaseta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wekî qonaxa herî xurt a guherîn û veguherînê tê dîtin. Siyaset û têkoşîna li ser paradîgmaya netewa demokratîk hatiye avakirin ne tenê ji bo gelê herêmê ji bo tevahiya Rojhilata Navîn dibe çavkaniya herî xurt ya serdama nû. Aliyên siyasî ango welatên vê rastiyê înkar bikin û berjewendiyên xwe li ser îradeya gelan ferz bikin, ne mimkûn e ku bikaribin di vê serdama krîtîk de serkeftinê bi dest bixin. Êdî bi her awayî aşkere ye ku li herêmê bi siyaseta înkarê serkeftin pêk nayê. Lewma bi berfirehî li ser rêveberiyên nenavendî û demokratîk tê rawestandin. Ev ne lazimiyek ji rêzê pêwîstiyek bingehîn a siyaseta vê demê ye.

Herî dawî, ev geşedan nîşan didin ku Sûriyeya nû hîn jî di navbera hêvî û krîzê de ye. Yekîtiya siyasî, parastina mafên gelê kurd û hemû pêkhateyên herêmê ji bo pêşeroja Sûriyeya yekgirtî û nenavendî xwedî girîngiyek mezin e. Hemû hêz û aliyên ku vê rastiyê înkar dikin, ango li dijî wê dikevin nava hewldanan ne mimkûn e ku di siberoja gelên herêmê de bibin xwedî gotin. Divê siyaseta li herêmê jî li gorî daxwaz û hêviyên gel be. Siyaset şaş an jî kêm, li şûna azadiyê dibe ku şer, kuştin, talan û qirkirinê bi xwe re bîne. Em ji bîr nekin ku gelek welatên herêmê ji bo li herêmê qaos kûr bibe û hîn bêhtir bibin xwedî gotin di nav hewildanan de ne. Ev dewletên ku siyasta xwe li ser şer û rijandina xwînê ava kirine ji bo dest biavêjin dewlemendiyên sererd û binerd ên herêmî jî di nav fêlbaziyan de ne. Lewma divê were zanîn ku siyaseta herî dijwar ne di demên şer de, di demên nîqaşên aştiyê de ye. Di van rojên zahmet de, ya girîng ew e ku gelê herêmê rê nîşanî siyaseta demokratîk bide.

Cahîd Kirkazak



# Rûpelek nû an durûtî?



Salek di ser pêvajoya aştî û demokrasiyê re derbas bû. Her çend geşedanên vê pêvajoyê ne bi temamî li gorî pêwistiyên pêvajoyên bin jî, bi pêşengî û înîsiyatîfa Ocalan gelek gav hatin avêtin. PKKê xwe fesih kir û çek berdan, lê tecrîda li ser Ocalan hîn jî berdewam e. Dengê Ocalan bi rêya şandeyên Îmraliyê digihêje raya giştî. Li meclîsê komisyonek hat damezrandin, û ev komîsyon bi beşên cuda yên civakê re hevdîtinan dike. Lê li gorî pêwistiyên vê pêvajoyê, xebatên komîsyonê heta cihekî tê û dixitime. Ev xitimandin encex pêşî vekirina deriyê ji bo ku Ocalan azad bixebite û destpêkirina muzakereyên rasterast bi Ocalan re vedibe.

Hemû kesên di vê pêvajoyê de beşdar in baş dizanin ku encameke serkeftî ya vê pêvajoyê bi muzakereyên bi birêz Ocalan re girêdayî ye. Di dîroka têkoşîna azadiyê ya cîhanê de, civakeke demokratîk û aştiyeke mayînde bi rêya muzakere û hevdîtinan pêk tê. Ev ceribandin şênber in. Birêz Ocalan gelek caran anî ziman: “Tenê kesên ku şer dikin dikarin li hev werin û şer bidin sekinandin.” Ev şer ne şerê gelê kurd û gelê tirk an gel kurd û civakeke din e. Lê ev şer nerazîbûna gelê kurd li hember nûnertî û rêveberiya komara yekperest e. Gelê kurd birêz Ocalan wekî vîna xwe îlan kiriye. Wekî ku hemû aliyên dewletê jî qebûl dikin, îradeya damezrîner û serokê PKKê Ocalan e. Ew ê ku karibe bi PKKê çek bide berdan û raya giştî ya gelê kurd îkna bike jî Ocalan e, ji ber ku gelê kurd û PKK bi Ocalan bawer e û serbilind e. Lewra, ji bo serkeftina vê pêvajoyê, divê komîsyona ku bi pêşniyariya Ocalan li meclîsê hatiye damezrandin, gaveke berbiçav biavêje û bi hevdîtinên rû bi rû bi Ocalan re dest bi muzakereyê bike.

Mixabin, heta îro gaveke şênber ji bo destpêkirina muzakereyên bi Ocalan re nehatiye avêtin. Hemû berpirsiyar berpirsiyariyê ji ser milên xwe davêjin. Lê êdî ev gihîştiye astekê ku bê muzakereyên bi Ocalan re, tiştek vê pêvajoyê bi rêve nabe. Ji ber vê yekê, di van rojên dawî de, pêwistiya hevdîtinên bi Ocalan re bi awayekî cidî û bi navên cuda tê ziman.

Wekî ku tê zanîn, pêvajo bi banga Bahçelî ya 22yê cotmeha 2024an dest pê kir. Bahçelî gotibû: “Ocalan bê meclîsê, di koma DEMê de biaxive, PKK fesih bike.” Ev bang di 2025an de bi hevdîtinên DEM Partiyê li Îmraliyê (28ê kanûna 2024, 22yê çile, 27ê sibat) û kongreya PKKê (5-7ê gulan) pêş ket. Komîsyona Meclîsê ya bi înîsiyatîfa Numan Kurtulmuş di tebaxa 2025an de hat damezrandin. Lê mixabin, Bahçelî sozên xwe neanîne cih. Ocalan hîn di bin tecrîdê de ye, mafê hêviyê nehatiye qebûlkirin û şert û mercên jiyaneke azad û xebateke azad ji bo Ocalan nehatine peydakirin. Lê Bahçelî baş dizane ku bê hevdîtin û muzakereyên bi Ocalan re, pêvajo nameşe. Ji ber vê yekê, wî Bahçeli di 7ê cotmehê de got: “Komîsyon dikare bi Ocalan re rû bi rû biaxivin, SDG/YPG jî bang bike.” Şêwirmendê Erdogan jî di 6ê cotmehê de got: “Guhdarîkirina Ocalan ne muzakere ye, tenê guhdarîkirin e; biryarên wî yên ‘damezrîner’ girîng in.” Ev gotin xweş xuya dikin, lê şert danîne, wekî banga li SDGê û nêzîkbûna wan ne bi rengê muzakereyê, bi rengê wergirtina beyanê ye. Eger ev gotin bi cih bên jî, ew ê pêvajoyê hiqûqî bikin, lê bê azadbûna birêz Ocalan pêk nayê. “Guhdarîkirin” bêyî reformên edaletê (mafê hêviyê yê DMMEyê, rakirina tecrîdê) ne bes e-ev wekî “ewarekirina civakê” xuya dike, ne guhertineke kûr.

Serokê meclîsê Numan Kurtulmuş jî di 26ê îlonê de li ser hevdîtina bi Ocalan re axivî û got: “Hêj ev mijar nehatiye nav rojeva komîsyonê. Eger bênav rojeva wê jî, komîsyon dê biryarê bide. Biryar bi piraniya bi taybet têne girtin. Biryareke ku ez bidim ne di rojevê de ye.” Bi rastî, hevdîtina komîsyonê bi Ocalan re rasterast berpirsiyariya Kurtulmuş e.

Lê Kurtulmuş ji lêystina rola xwe direve. Serokê giştî yê CHPê Ozgur Ozel jî li ser nîqaşên hevdîtin û muzakereya bi Ocalan re wiha got: “Eger meclîs wê tiştekî bi vî rengî bixe rojeva xwe, bila bixe rojevê, em bibînin. Bila serokê meclîsê bixe rojevê, MHP û AKP helwesta xwe nîşan bidin. Paşê jî bên ji min bipirsin. Bila AKP destpêkê helwesta xwe diyar bike. Hejmara heyetê diyar bike. Serokê meclîsê ji kîjan partiyê kê vedixwîne, bila bike. Bi şeytankirina CHPê re, dema ku bê hesabê wan, bila nedin pêş.” Di mijara muzakereyên bi Ocalan re, heta îro Erdogan û AK Partî tiştekî zelal negotine, tenê peyvên “rûpelek nû”, “em bazarî nakin”, “Tirkiyeya bê teror” dubare dikin. Lê ji bo rûpelekê nû, tu gaveke hiqûqî an siyasî navêjin. AKP û Erdoğan di derbarê hevdîtin û muzakereyên bi birêz Ocalan re bi dilê xwe dibêjin ku raya giştî ji bo muzakereyên bi Ocalan re ne amade ye, û berpirsiyariya xwe dispêrin raya giştî.

Em vê yekê eşkere bêjin: Kes birê ji berpirsiyariya xwe nereve. Di serî de Bahçelî sozên xwe yên 22yê cotmeha 2024an bi cih bîne; azadbûna fîzîkî ya Ocalan pêk bê, da ku Ocalan ji bo aqûbeta vê pêvajoyê rola xwe ya dîrokî bilîze û muzakere di şert û mercên wekhev de bike. Serokê meclîsê û serokê komîsyonê Kurtulmuş birê berpirsiyariya xwe bilîze û di demek zû de ji bo hevdîtin û muzakereyên bi Ocalan re hevdîtin pêk bîne. Heman berpirsiyarî berpirsiyariya meclîsê û muxalefetê ye jî. Lewma, meclis û muxalefet nikare bêje da ‘ku ev mijar were rojevê’ û ji berpirsiyariya xwe bireve. Lê berpirsiyariya herî mezin ya dewletê û desthilatdariyê ye. Ji ber vê yekê, Erdogan û AKP ji bo hevdîtina bi birêz Ocalan re rojek beriya rojekê tevbigerin û ji bo ku ev pêvajo biguhere, aştiyeke mayînde û civakeke demokratîk dest bi muzakereyê bike.

Dema ku hûn dibêjin raya giştî ne amade ye, ev tê wateya ku hûn bi durûtî tevdigerin. Ji ber ku raya giştî baş dizane û dijopîne ku hûn li girava Îmraliyê bi birêz Ocalan re hevdîtinan dikin. Lê hûn naxwazin dengê birêz Ocalan ê aştî û demokrasiyê bigihêje raya giştî. Ji ber ku eger dengê birêz Ocalan bigihêje raya giştî, ew ê derxe holê kî aştiyê dixwaze û kî ji aştiyê direve. Ji bo ku kêmasî û durûtiya we dernekeve holê, hûn dibêjin “raya giştî ji bo hevdîtin û muzakereyên bi Ocalan re ne amade ye”. Raya giştî ji bo aştî û civakeke demokratîk amade ye û baş dizane ku rêya aştî û civaka demokratîk bi rola û bandora Ocalan ve gaveke sereke ye.

# Trump: Erdogan bi Hamasê re têkilî danî

## Ey Erdogan tu çawa dikarî li ruyê mirovahiyê binêrî, gava te gelên Serêkanî û Efrînê ji cih û warên wan der kirin, te çeteyên DAIŞî li malên wan bi cih kirin, ma ev ne guhertina demografiyê ye?



Hesen Huseyîn Denîz

Di navbera Hamas û Îsraîlê de agirbest pêk hat. Ev bi biryara Amerîka û Trump pêk hat. Lê ka binêrin bê bi navbeynkariya kê? Bi navbeynkariya kesekî ku li erd û ezman dijminatiya kurdan dike, bê sedem serokên kurdan birêz Ocalan, ji parlamentarên kurd Selehattîn Demirtaş, Fîgen Yuksekdag, Leyla Guven, Semra Guzel, Nazmî Gur, ji şaredarên kurd Selçûk Mizrakli, Ayşe Gokhan, Bekir Kaya û ji endamên komîteya navendî gelek kesan diavêje zindanê û tevî biryarên dadgehên neteweyî û navneteweyî naxwaze wan berde. Yek ji van jî li hember dewleta tirk çek bi kar neaniye, lê HAMASê li hember Îsraîlê bi sedan caran çek bi kar aniye û herî dawî di roja 7ê cotmeha 2023yan bi avêtina pênc hezar roketan êrîşeke mezin da destpêkirin û di encama vê êrîşê de 1200 îsraîlî mirin û 250 îsraîlî dîl hatin girtin û revandin birin Xezayê. Li ser tevna înternetê ji aliyê Hamasê ve videoyên îşkenceya li jinên cihû hatin kirin hatin weşandin. Tevî vê yekê serokê Komara Tirkiyeyê Erdoganê ku neyartiya kurdan ji bo xwe wek prensîb dibîne, li gor gotina ji devê serokê Amerîkaya Yekbûyî Trump navbeynkariya HAMAS û Îsraîlê kiriye, bi serokên Hamasê re hevdîtin kiriye û ew îkna kirine ku bi Îsraîlê re li hev werin. Niha dixwazim ji Erdogan bipirsim:

-Tu derdikevî derveyî welêt û dibêjî "qedexekirina ziman sûcê mirovahiyê ye", lê tu qedexeya li ser zimanê kurdî ranakî,

-Tu ji bo gelê Filistînê çareseriyeke bi du dewletan dixwazî, lê ji bo kurdan dibêjî "yan wê çekên xwe berdin yan wê tevî jin, zarok û hemû hebûna xwe werin kuştin",

-Tu dikevî navbera Îsraîl û Hamasê, navbeynkariyê dikî ku esîrên hamasî werin berdan, lê tu zindanên Tirkiyeyê tije kurd dikî, dayikên heftê salî, nexweşên li ber mirinê bi israr di zindanê de digirî,

-Tu ji bo Îsraîl û Hamas li hev werin hemû derfetên dewleta Tirkiyeyê bi kar tînî, lê ji bo li Rojava kurd nebin xwediyê statuyekê; bi tanq, top, drone û balefiran êriş dikî û gef li wan dixwî ku tev li Sûriyeyê nebin, tê wan qir bikî. Tu û Hakan Fîdan û Îbrahîm Kalin terorîstê DAIŞî Colanî li hemberî kurdan sor dikî û dixwazî li Halebê destkeftiyên kurdan têk bibî.

- Ger Îsraîl bibêje, "bila Filistîn tev li me bibe, di serî de Hamas hemû filistînî çekên xwe berdin û bila tiştekî ji me nexwazin, em ne qebûl dikin ew bibin dewlet, ne bibin xwedî federe, ne bibin xwediyê xweseriyê, bila xwe fesh bikin, li hember me şer nekin, hemû çekên xwe bişewitînin û bi ku ve diçin bila biçin", tê qiyametê rakî, lê tu heman tiştî bi zêdetirî bi serê kurdan de tînî û dîsa jî kela dilê te li kurdan hênik nabe.

- Gava li Xezayê jin û zarok hatin kuştin, te Netenyahû bi teroristiyê tawanbar kir, lê tu derketî ser ekranên televizyonan û te gef li jin û zarokên kurdan ên ji bo azadiya zimanê dayikê daketibûn qadan xwar û got, "jin bin jî, zarok bin jî, ji bo tunekirina wan çi pêwîst be em ê bikin'' û bi fermana te bi sedan jin û zarokên kurdan hatin kuştin.

-Ji ber ku leşkerên Îsraîlê ketin Xezayê û mal û avahiyên wan xera kirin, te berê miletê da qadan û te gef li Îsraîlê xwar û te ew bi guhertina demografiya wir, valakirina axa filistîniyan û pêkanîna qirkirinê tawanbar kir, lê qet dilê te bi kurdan neşewitî gava te tanq, top û dozerên xwe şandin ser Cizîra Botan, Sûra Amedê, Hezex, Nisêbîn, Şirnex, Sîlopî, Gever, Lîce û Êlihê. Te malên kurdan bi erdê re kirin yek, jin, zarok û ciwan di jêrzemînan de bombebaran kirin û xanî bi ser serê wan de hilweşandin, ji tirsa zilma te dayikan termên zarokên xwe di sarincan de bi rojan li ba xwe girtin. Termên dayikan bi rojan li erdê li nav kolanan dirêjkirî man, te bi hezaran mirov ji cih û warên wan koçî metropolan kirin û li wê derê mehkûmî rebenî û belengaziyê kirin. Te wek polîtîkayeke dewletê berê zarok û ciwanên kurd da madeyên hişbir û jiyan li wan kir jehr!

Ey Erdogan em kurd te vedixwînin duristbûnê! Çi ye ev durûtiya te? Çima ji bo filistîniyan aştî, wekhevî, azadî û xwedîdewletbûnê dixwazî, lê çima bi ser kurdan de bombe û roketan dibarînî, koletî, bêdadî, şer, mafxwarî, zilm, zordarî, înkar û îmhakirinê, bêzimanbûn, bêserwerbûn, bêmafmayîn û tunebûnê rewa dibînî? Ma ev ne durûtî, ne dijmintî, ne xwînxwarî û ne mafxwarî ye?

Ey Erdogan tu çawa dikarî li ruyê mirovahiyê binêrî, gava te gelê Serêkanî û Efrînê ji cih û warên wan der kirine, te çeteyên DAIŞî li malên wan bi cih kirin, ma ev ne guhertina demografiyê ye?

Ey Erdogan, ji aliyekî ve tu û Dewlet Bahçelî qala xwişk û biratî, aştî, dostaniya kurdan dikin, lê li aliyê din bi hezaran leşker û tanq û top li başûrê Kurdistanê, li bakurê Kurdistanê, li rojavayê Kurdistanê bi cih dikin û tenê rêya mirinê, rêya teslîmiyet û xiyanetê didin ber kurdan. Ev çawa dostanî, xweşk û biratî û aştî ye, ku aliyek dewlemend dibe, serdar dibe, serwer dibe, dilxweş dibe, lê aliyê din feqîr dibe, bindest dibe, mehrûm dibe û xemgîn û tune dibe?

Ey Erdogan, tu dizanî bê te çend hezar kurd ji cih û warên wan rakirin û berê wan dan giştiya cîhanê û niha bi hezaran kurd li ber devê deriyê Ewropa, Îskandinaviya, Brîtanya û welatên din reben, perîşan, bê nasname, bê maf, bê heq û hiqûq dinalin?

Ey Erdogan, sîstema te û ya welatê te û ya dewleta te, zagonên vê dewletê, leşker, polîs û ajanên wê, çek û derfetên wê tev ji bo tunekirina kurdan dixebitin û tên bikaranîn. Dewleta te serê bi hezaran kurdan xwar, ji roja avabûna komara Tirkiyeyê heta îro we gelê kurd qir kir, we serokên kurd darve kirin û xistin gorên nediyar û heta îro jî we ev gor aşkere nekirine û wek Dayikên Şemiyê giştiya gelê kurd ji hembêzkirina hestiyên zarokên xwe û serokên xwe mehrûm kirin.

Ey Erdogan, ji aliyekî ve tu û Dewlet Bahçelî rojane heyetan dişînin Îmraliyê, bang lê dikin û qala rêyên aştî û çareseriyê dikin, lê tevî biryara dadgeha Mafê Mirovan ne azadberdana birêz Ocalan, ne ya Selahattîn Demîrtaş û ne ya bi sedan girtiyên kurd ên nexweş, ên bêsûc û bêguneh tenê ji bo kurd in we ew avêtine binê zindanan naxin rojeva xwe û dijmintiya xwe ya li hember hebûna kurdan didomînin.

Ey Erdoganê durû, tu wê navbeynkariya ji bo Hamas û Îsraîlê dikî, tu çima ji bo tirk û kurdan nakî? Gava tu ji Îsraîlê dixwazî êsîrên Hamasî berde, tu çima êsîrên di dest xwe de bernadî, gava tu ji bo filistîniyan ji Îsraîlê du-dewletbûnê dixwazî, tu çima ji bo kurdan federasyon, xweserî yan dewletbûnê rewa nabînî, gava tu Îsraîlê li hember filistîniyan û Hamasê wek dewleteke terorê û serokê wê Netenyahû wek terorîst bi nav dikî, tu çima li hember kurdan dewleta Tirkiyeyê wek dewleteke terorê û serokê wê Erdogan jî wek terorîst bi nav nakî? Gava tu ji bo qaşo vê terorîzma li hember Hamasê bi dawî bikî di navbnera Amerîka, Hamas û Îsraîlê de xwe diperitînî, çima tu dijmintiya kurdan dikî, gef li Rojava dixwî û kurdan bi piştgiriya Amerîka û Îsraîlê tawanbar dikî û dixwazî wan ji piştgiriya van dewletan mehrûm bihêlî? Ji bo tu hevdîtinekê bi Trump re bikî tu bergerê dikî, bertîlê didî, balefiran dikirî, lê gava amerîkî alîkariya Rojava bikin tu dilxerab dibî.

Ey Erdogan, çima tu wiha durû yî?





Kurdistan Lezgiyeva

# Çend gotin li ser hevdîtinên Trump-Erdogan

Di serdema serokatiya Joseph Biden de, serokkomarê Tirkiyeyê qet li Qesra Spî hevdîtinek şexsî  nekir û têkilî pir aloz bûn. Aloziyên siyaseta derve di navbera her du hevalbendan de jî pir zêde bûn. Xistina droneke Tirkiyeyê li ser Sûriyeyê ji aliyê Pentagonê ve di cotmeha 2023yan de, bû sembola van nakokiyan.

Parastina leşkerî ya stratejîk a Rûsyayê bû çavkaniyeke din a nakokiyan. Wezareta Xezîneyê ya Dewletên Yekbûyî pêşî gef li gelek şîrketên tirk xwar û dû re jî ceza li wan ferz kir. Projeya Santrala Hêza Nukleerî ya Akkuyu ya stratejîk rastî êrîşê hat. Piştî hilbijartina xwe ya ji nû ve, sala 2023yan, Tayyîp Erdogan hewl da ku têkiliyên xwe bi rêveberiya Biden re sererast bike û di civîna NATOyê de ku li Vilniusê pêk hat, qonaxeke têkiliyên nû bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) re ragihand.

Lê belê, ji nû ve destpêkirina têkiliyên bi rêveberiya berê re bi ser neket. Nakokiyên stratejîk li ser mijarên dualî, di nav de Sûriye, Ukrayna û başûrê Qefqasyayê, berdewam kirin. Ji ber vê yekê, hatina Donald Trump ser desthilatê, li Enqereyê bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin.

Hêviyên mezin li ser wî hatin danîn, ji bo lihevkirina li ser rakirina cezayên CAATSAyê, çareserkirina pirsgirêka kurd li Sûriyeyê û çareserkirina nakokiya Ukraynayê, ku siya xwe da ser armancên navbeynkariyê yên Stenbolê û gef li ser windahiyên darayî ji bo şîrket û bankayên Tirkiyeyê xwar.

Trump di cih de amadebûna xwe ya hevkariyê bi Tirkiyeyê re nîşan da û Erdogan wekî ''dostê'' xwe bi nav kir. Guhertina desthilatdariyê li Şamê, 8ê kanûna 2024an, "rêza" komarparêzan ji bo hevkarê xwe yê NATOyê hîn xurttir kir. Ji wê demê ve, wî di axaftinan de bi berdewamî bi bîr xist ku Erdogan di desteserkirina desthilatdariya Şamê de bi ser ketiye. Ev yek jî nîşan dide ku muxalefeta alîgirê Tirkiyeyê li Sûriyeyê serdest e.

Înîsiyatîfên "Aştiyê" yên Trump li Ukraynayê ji hêla Erdogan ve bi germî hatin pêşwazîkirin. Her çend Stenbol destpêkê hat paşguhkirin û şêwirmendiyên yekem ên di navbera Wezareta Derve ya Rûsyayê û Wezareta Derve de li Riyadê pêk hatin jî, Tirkiye di demek kurt de dîsa statuya xwe ya navbeynkar bi dest xist. Du dewreyên danûstandinan li ser vegerandina têkiliyên dîplomatîk di navbera Dewletên Yekbûyî û Rûsyayê de li Stenbolê hatin lidarxistin. Bi vê paşxaneya erênî ya berfireh, Erdogan, 25ê îlona 2025an, ji bo serdana xwe ya yekem a Qesra Spî piştî demek dirêj gihîşt Amarîkayê.

Daxuyanîya Trump der barê cezayên ku wî bixwe ji bo kirîna pergala parastina hewayî S-400 ên rûsî ji aliyê Tirkiyeyê ve ferz kirine, li Tirkiyeyê geşbîniyek çêkir. Donald Trump, di bersiva pirseke li ser îhtimala rakirina cezayan de got, "Ger em civîneke baş bikin, ev dikare pir zû, hema hema tavilê çêbibe." Rojnamevanên tirk nîşana balafirê li ser lepê Trump dîtin. Lê belê, yekser piştî civîna du saetan, aşkere bû ku tu rêkeftinên cidî nehatine kirin. Di civîna çapemeniyê de, Trump diyar kir ku ji bo bidawîkirina peymana F-35, divê Erdogan "tiştekî" ji bo wan bike.

Ev "tiştek" berbiçav e. Komarparêz berdewam kir, "Tiştê herî baş ku ew dikare bike ev e ku dev ji kirîna petrolê ji Rûsyayê berde." Hêjayî gotinê ye ku petrola Rûsyayê bi qasî ji sedî 90 ji îtxalata petrolê ya Tirkiyeyê pêk tîne. Di rewşek krîzek darayî û enflasyonê de, her çend sivikkirî be jî, lê dîsa jî berdewam dike û herwiha têkoşîna dijwartir a di navbera rayedar û Partiya Gel a Komarî ya muxalefetê de, encamên aborî û siyasî ji bo Erdogan zêde nayên nirxandin.

Li ser mijarên jeopolîtîk, tevî lihevkirina li ser bidestxistina agirbestê ya li Xezayê (wekî ku Erdogan di balafirê de nîşan da) jî, hevrêziya Amerîka û Tirkiyeyê dê bi dijwariyên girîng re rû bi rû bimîne. Her çend serokkomarê Tirkiyeyê israr dike ku Hamas û çareseriyeke aştiyane ji bo pevçûna Xezayê peyda bike jî, Trump bi vebijarkeke leşkerî razî ye. Helwesta serokkomarê Amerîkayê li ser Hamasê hêdî hêdî bi pêş ketiye. Her çend berê ew piştgiriya diyalogê bi koma filistînî re dikir jî, niha wî ji bo jiholêrakirina wê destûr daye û bi bêdengî piştgiriya dagirkirina Xezayê ji hêla Îsraîlê ve dike. Ne tesaduf e ku Trump biryara 10 welatên rojavayî ya ji bo naskirina serxwebûna Filistînê, di Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî de rexne kir. Berovajî vê, Erdogan pêşwaziya ev kiryar kirin.

Li gor Tirkiyeyê tenê encama erênî ya kêm-zêde berbiçav a hevdîtinên Qesra Spî memoranduma (hişyariya) li ser hevkariya nukleerî ya sivîl bû. Piştî temamkirina projeya Akkuyuyê, rayedarên Tirkiyeyê dixwazin du santralên din ên nukleerî li Trakya û Sînopê ava bikin. Şîrketên Koreya Başûr û Rosatomê eleqeya xwe nîşan dane. Her çend der barê projeyan tu biryar nehatibin dayîn jî, şîrketên amerîkî şanseke wan heye ku bi Moskow û Seulê re pêşbaziyê bikin.

# ‘Divê ciwan ji tiryak û hişbirê rizgar bibin’

**Hevberdevka Platforma Şiyar Be Gulşen Demîr têkildarî xebat û têkoşîna li dijî tiryak û hişbirê axivî. Gulşen Demîr diyar kir ku di pêvajoyeke wiha de divê ciwan ji tiryak û hişbirê rizgar bibin û bi awayekî aştiyane bijîn**

| Rohat Bulut




Hevberdevka Platforma Şiyar Be ya têkoşîna li dijî tiryak û hişbirê parêzer Gulşen Demîr der barê xebatên xwe axivî. Gulşen Demîr diyar kir ku piştî avakirin û deklareya Platforma Şiyar Be, gelek xebatên wan çêbûne û destnîşan kir ku di çarçoveya xebatan de wan encamên baş bi dest xistine û li gorî wê bername û plansaziya xwe kirine. Gulşen Demîr ev tişt anî ziman: “Piştî deklareyê ku em daketin kolanan, me dît ku li gelek bajarên Kurdistanê ev pirsgirêka tiryak û hişbirê gelekî bandorê li gelê me dike. Ji ber wê yekê li her bajarê ku em çûnê, ji me xwestin ku em nûnertiya ‘Şiyar Be’ li wê derê jî ava bikin. Me jî li Şirnex û Êlihê bi nûnerên saziyên demokratîk re xebat û tecrûbeyên xwe yên di pêvajoya platforma ‘Şiyar Be’ de bi wan re parve kirin. Li van her du bajaran jî Platforma Şiyar Be hat avakirin. Niha bajarên Wan û Mêrdînê jî li benda me ne ku em li wan deran parvekirinên xwe bikin ku ew jî platforêmên xwe ava bikin. Piştre jî li bajarên din dê ev xebat bidome.”

Gulşen Demîr destnîşan kir ku dema platfoma xwe ava kirine dizanîbûne ku bi demkurtî çareserî nabe û wiha domand: “Rêyeke pir dirêj li pêşiya me heye. Ji bo em bigihîjin armanca xwe pêdiviya me bi sebrê û gelek xebatan heye. Heta niha li Amedê li gelek taxan me xebatên xwe kirin. Her wiha li sê parkên mezin ên navendî yên Amedê me ji bo 3 rojan kon veda û me xwest ku gelê me û kesên li ser hişbirê pispor in werin cem hev ku dikaribin biaxivin û çareseriyekê bi pêş bixin.”

Bi berdewamî Gulşen Demîr diyar kir ku ji xebatên ku pêş dixin encamê digirin û da zanîn ku di çalakiyên meş û danîna kon de gelek malbatên ku zarokên wan di nav pençê tiryak û hişbirê de ne xwe gihandine wan û alîkarî xwestine. Demîr ev agahî jî par ve kir: “Niha li Şaredariya Amedê yekîneyeke pispor heye ku ji bo vê dixebite. Malbatên ku tên cem me jî em arasteyî ew yekîneya pispor dikin.”

**Ji bo tedawiyê dem pêwîst e**

Der barê serlêdanên malbatan û dermankirinê jî Demîr destnîşan kir ku heta niha 10 malbatan serî li wan daye, ji gelek navçeyan jî daxwaza hevdîtinê çêbûye û diyar kir ku pêvajoya dermankirinê hinekî dirêj diajo. Gulşen Demîr bi lêv kir ku hevalên wan ên pispor xwe gihandine kesên ku serî li wan dane û dê tedawiya wan demekê bidome û da zanîn ku dibe ku ev 6-7 meh in li kolanan xebatên xwe dikin lê ji bo tedawiyê dem pêwîst e. Demîr got ku dê car caran encama xebatên xwe bi çapemeniyê re par ve bikin.

**Dê navendekê ava bikin**

Der barê xwe gihandina gel a platforma wan jî Gulşen Demîr ev tişt got: “Me belavokên xwe amade kiribûn. Standên me hene û her wiha li ser gelek platformên dîjîtal û yên ragihandinê em mijarê vedibêjin ku gel xwe bigihîne me. Em ê di demeke nêz de jî nevendekê ava bikin ku li navnîşanekê kesên bixwazin dikaribin xwe bigihînin me.”

Ne tenê ji pêkhateyên platformê dê kesên dildar jî dikaribin di nav vê xebatê de cihê xwe bigirin. Di vî warî de jî Gulşen Demîr wiha got: “Wekî platform di destpêkê de ji pêkhateyên nûnerên partî û saziyan pêk dihat. Lê em dixwazin kesên ku bi dildarî bixwazin tevli vê xebatê bibin werin cem me. Ji bo wê jî dikarin bi me re têkevin têkiliyê û tev li xebatên me bibin.”


Li şûna ku kesên mubtela werin serî li wan bidin dê ji bo xwe bigihînin wan û derman bikin xebatan dikin. Li ser vê mijarê jî Gulşen Demîr wiha got: “Di meha pêşiya me de em ê dest bi vê xebatê bikin. Li navçe û taxan em ê nûnertiyên xwe jî ava bikin ku bi rehetî dikaribin bi wan re têkiliyê deynin. Yên ku nikaribin werin serdanê jî dê hevalên me biçin xwe bigihînin wan.”

**Bi komisyonan dimeşînin**

Gulşen Demîr bi berdewamî wiha got: “Me li ser sê komisyonan xwe ava kiribû. Yek ji wan, komisyona rêxistinbûyînê. ya din komisyona çand û çapemeniyê bû. Ya din jî komisyona perwerdehî û stratejiyê bû. Hevalên me yên di komisyona perwerdehî û stratejiyê de ji bo materyalan xebatên xwe berdewam dikin. Divê saziyên sivîl ên civakî, partiyên siyasî û şaredariyên me her wiha bijarteyên vî gelî wekî, parlamenter, hevşaredar û hevsrokên partiyên me jî di nav van xebatan de cih bigirin. Lewre dê ev xwetevlêkirin ji bo pêşketina xebatên me û ji bo mînakgirtina gelê me hîn baştir be.”


**Divê her kes dest bide vê xebatê**

Gulşen Demîr diyar kir ku dê di 18-26ên Cotmehê de beşdarî fûara pirtûkan a ku dê li Amedê pêk bê jî bibin û xebata xwe bi gel re par ve bikin û bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: “Em jî wekî platforma ‘Şiyar Be’ girîngiyê didin banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ‘Aştî û Civaka Demokratîk’ lewma jî em dibêjin di pêvajoyeke wiha de divê gelê me, ciwanên me ji tiryak û hişbirê rizgar bibin û bi awayekî aştiyane bijîn. Divê herkes dest bidin vê xebatê û em bi ser bikevin.”



Ahmet Aktaş

# Aştî û êrîş çawa bi hev re dimeşin?



Ka em gotina dawiyê pêşiyê bêjin; ji bo ku destê Rêber Apo lawaz bikin, êrîşên xwe yên li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê didomînin. Yên êrîşan aşkere didin meşandin û li ber çavan tên xuyakirin, dibe ku çeteyên girêdayî Colanî bin, heta dibe ku ji bo xwe rewa bidin nîşandan, bi fermî xwe bi navê Artêşa Sûriyeyê jî xwe nîşan bidin.

Lê li pişt vê hêza cihadîst û jenosîst, bêguman dewleta tirk a di bin desthilata Receb Erdogan de heye. Ka ji bo ku hinek din jî zelaltir bibe; desthilata di ser dewleta tirk re jî DYA ye û ev rastî ne veşirî ye.

Ma dema civîna bilind a NYê, di civîna taybet a Rojhilata Navîn de, Trump li pêş kameraya aşkere negot; “Ev kabira (Erdogan destnîşan kir), gelek zîrek e û pirsgirêka Sûriyeyê wî bi hêsanî hal kir, hema bi rehetî Colanî ji Idlibê rakir ew anî li Şamê kir desthilatê Sûriyeyê”!

Vê gotina Trump, dema darbeya leşkerî ya Kenan Evren a 12ê Îlonê anî bîra mirovan; balyozê wê demê yê DYAyê, ji bo vê derbeya faşîst peyam şand ji dewleta xwe re û got, “Zarokên me, karê xwe gelek bi serkeftî û hêsanî pêk anîn”!

Naveroka gotin û peyamên wan çawa dişibin hev ne? Jixwe tê zanîn ku hemû fermandarên mezin ên artêşa tirk, bawernameya xwe ya ji bo mezinbûna fermandariyê-kurmay di arteşê de, ji DYAyê wergirtine û Kenan Evren yek ji wan bû.

Ma Receb Erdogan jî, hema di heman rêya paralelî vê sistemê re derbas nebûye? Belê, dema li Tirkiyeyê hat ‘girtin’, di wan çend mehan de ji aliyê misyonerên amerîkî ve hat perwerdekirin, li derve ji bo wî partî (AKP) hat damezirandin, paşê ji zindanê-perwerdexaneyê derxistin û ew bi lez kişandin Amerîkayê. Li wir mîna serokê dewletê hat pêşwazîkirin û heta roja îro ew mekanîzma ya ku ava kirine tê birêvebirin…

Ji bo hilbijartinên mizewer-sixte-qelp, li ser pirsa rojnamegeran Trump got, ‘vê pirsê jî ji Receb Erdogan bikin, ew ji herkesî baştir vê mijarê dizane’. Ev bersiva wî jî gelek balkêş bû û mijara me ya li jor hîn xurtir dike.

Îcar, wisa diyar dibe ku di vê serdemê de jî, ji bo hinek plan û projeyên wan ên xerabker hê pêdiviya wan bi Receb Erdogan heye.

Li gor hewldanên wan ên van demên dawî, tê xuyakirin ku wê Receb Erdogan bikin koordînatorê van desthilatên cîhadîst û jenosîst ên mîna Afganistan û Şamê. Herwiha hewldan heye ku li hinek welatên din ên mîna Iraq û Lubnanê jî desthilatên xwedî heman zihniyetê ava bikin û di bin fermandariya Receb de bidin xebitandin.

Bêguman, wê van desthilatan, di serî de li dijî Îranê bi kar bînin û şerkirin, da ku bikaribin li dijî Rûsya û Çînê bi hêztir bibin. Belê, li aliyê din yê yekser têkildarî Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê ye, niha di serî de desthilata Colanî ye. Li pey wê di rêzê de desthilatên Îran, Iraq û Tirkiyeyê ne.

Siyaseta ku DYA bi nûnerên xwe Barrack û fermandarê CENTCOMê Cooper re dide meşandin, îdarekirina her du aliyan e, wateya ev e, “bila HSD û Colanî, dilê wan nemîne, bila her du jî dostên min bin…”

Ma gelo HSD û Colanî çawa dibin mîna hev? Yek Colanî ku dijminê gel û baweriyên cuda û jinan e!

Ya din HSD ku dostê hemû gel û baweriyên cuda, jinan, ekolojî û herwiha li gel hemû tiştên hêja, bi rûmet, azad, demokrat û aştîxwaz e!

Gotin û kirinên her du aliyan jî li ber çavan in. HSD, heta niha ji bilî DAIŞê û yên mîna wan êrişî kê kiriye? Colanî heta niha ji bilî DAIŞê û yên mîn wan, ma gelo tu kes û alî mane ku êrîşî wan nekiribe û jenosîdpêk neanîbe? Piştî elewiyên beravê û durziyên Siwêdayê, vê carê bi hemû hêza xwe êrîşî ser kurdan kir; Şêxmeqsûd û Eşrefiya Helebê û gelek deverên din!

Weke gotina despêkê hat kirin; êrîş û bazaran bi hev re yan jî aştî û êrîşan bi hev re dimeşînin. Hêvî û miraza wan ev e ku, ka gelo wê bikaribin îrade û têkoşîna gelê Kurdistanê bişikînin û bi vê re li Îmraliyê, di bazara siyasî de destê Rêber Apo lawaz bikin.

Lê him gelê me û him tevgera gelê me dîsa qehremaniya xwe nîşan da û rê neda serkeftina wan û mirazê wan di qirika wan de hişt. Erê, weke her car tê gotin, divê tu caran neyê jibîrkirin ku, xeterî xelas bûne û bila kes xwe piştvala nehêle. Lê mirov dikare bêje temenê desthilata Receb Erdogan û Colanî ne dirêj e û dibe ku ev êrişên wan ên dawî xweceribandin bin.

# Demokrasîyo muzakerevan

Seba çareserîya persanê bingeyîyan demokrasîyo rasterast girîng o. Sey leteyê nê tewrê demokrasî demokrasîyo muzakerevan eşkeno seba çareserîye perspektîfêkê destdaye biaferno



Dr. Îsmet Konak





Seke zanîyeno çekuya “demokrasî” eslê xo de yunankî ya. “Demo” yeno manaya şarî, “kratos” zî yeno manaya îqtîdarî. Wirdî çekuyî yenê têhet û benê “îqtîdarê şarî”. Demokrasî de bi destê şarî şuxilnayîşê serdestîye esas o. Xeylêk formê demokrasî est ê. Înan ra yew demokrasîyo temsîlî yo. Nê demokrasî de serdestîye rasterast bi destê şarî nê, bi destê temsîlkaranê ke weçînîyenê yena xebitnayene.

Nê formê demokrasî de şar têna weçînayîşan reyde tewrê îdareyî beno. Mîyanê şar û temsîlkaran de “têkilîyêka temsîlî” yan zî “morfolojîke” est a. Persê ke şarî eleqedar kenê, parlamento de yenê nîqaşkerdene û bê îradeyê şarî yê rasterastî qerarî gêrîyenê. Mîsal Tirkîya de demokrasîyo temsîlî est o. No demokrasî bîla binê xeterî de yo. Çike yew merdim, yanî Erdogan wazeno “otokrat” bibo, parlamentoyî “pasîfîze” bikero û sey totem bêro bimbarekkerdene. Yanî serdestîye hetê temsîlkaran zî nêna gurênayene. Tirkîya mîyanê otokrasî û demokrasîyê temsîlî de sey “derguşe” hêjîyena. Rejîmê Erdoganî “omnîvore” yo, ey pêro ercê exlaqî û huqûqî werdî.

Yew formê demokrasîyo bîn “demokrasîyo rasterast” o. Nê tewrê demokrasî de serdestîye hetê şarî ra rasterast yena xebitnayene. Yanî derheqê dewlete yan îdareyî de heme qerarî bê mabênkar gêrîyenê. No formê demokrasî formo ke demokrasîyê îdealî rê tewr nêzdî yo, yo. Yeno fikrîyayene ke verê cû şaristananê yunanan de yanî “polîsan” de şar raşteyan de ameyêne têlewe, derheqê persan de nîqaşî kerdêne û netîce de qerarî girewtêne. Dima ra nê qerarî dîyêne îdarekaran û peynîye de konsensus virazîyêne. Labelê nê şeklê demokrasî yê prîmîtîvî de têna “camêrdî” est bîyî, îradeyê cinîyan û bendeyan çin bî. Polîs yan cîvîtas bi destê meclîsêko têna hemwelatîyanê camêrdan ra ameyêne pê, îdare bîyêne. Ewro no formê demokrasî têna Swîs de çend kantonan de est o. Merdim xo vîr ra nêkero ke demokrasîyê rasterastî de “îqtîdar, otorîte û hîyeraşî” mînîmîze beno.

**Teorîya Karê Komunîkasyonî**

Nê rojan mefhûmê “demokrasîyo muzakerevan” zî zaf yeno nîqaşkerdene. Bi taybetî Serekê PKK’yî Abdullah Ocalanî bale ante nê mefhûmî ser. Seke zanîyeno demokrasîyo muzakerevan îngilizkî (deliberative democracy) ra ameyo açarnayene. Çekuya “deliberative” nîqaşkerdiş, fikrîyayîş, ercnayîşî reyde eleqedar bena. Yanî demokrasî yo ke nîqaşanê xorînan û gargarkerdişan esas geno yo. Nê formê demokrasî de goşdarkerdiş û fikrê merdimê bînî rê rêzdarîye muhîm ê. Bi no hawa qerarê ke komelî eleqedar kenê, bi aqlê hemparî  gêrîyenê. Tayê cigêrayoxî nusenê ke bingeyê nê formê demokrasî de “Teorîya Karê Komunîkasyonî” ya Jurgen Habermasî est a. Habermas vano ke normê ke mîyanê ci de komelo demokratîk ciwîyeno, berhemê muzakereyê pêroyî yo ke hemwelatîyî pîya virazenê yo.

**Komara demokratîke**

Ewro Tirkîya de yew prosesê demokratîkbîyayîşî domîyeno. Baxusus komelê Kurdîstanî wazeno ke heme persê ci bi şeklêko radîkal bêrê çareserkerdene. Na çarçewa de nîqaşkerdiş û goşdarîkerdiş girîng ê. Komel paweno ke netîceya nê prosesî de hem Tirkîya hem zî Kurdîstan de demokrasîyo rasterasto ke qîymet dano “muzakereyan” bêro awankerdene. Seba xelasa heme şaran, nasnameyan, ziwanan û kulturan têna yew “opus magnum” est o, o zî “komara demokratîk” a.

---

Nesrîn Navdar

# Xoza birîndar a


Her wext merdimî semedê rehetîya xo xebetîyayê. Henî tewirê heywanan semedê ciniştişê xo û baranê xo kedî kerdê. Henî semedê ke goşt, şit, poste û mûyanê înan ra nefe bigîrê kedî kerdê, henî semedê muhefeze û ewlehîya xo kedî kerdê heta henî semedê zewq û kêfweşîya xo kedî kerdê. Ancî kedîkerdişê heywanan de nêmendê; dest eşto tar û tûran, vaş û nebatan. Çeşîdê xele, zebze û fêkiyan zî kifş kerdê û înan ra feyde girewto. La sey ke yeno zanayîş, tenê heywan û mehsulanê zîretî de nêmendê, hetê setirîyayîşî, xoradayîşî û xupawitişî de zî mehsulî îcad kerdê. Her ke wext derbas bîyo sitareyê xo yê sadeyî ke kerpîç, kere yan zî daran ra û bi qiwetê xo û hunerê destanê xo viraştêne ageyrnayê ban û awanîyanê şekildaye û averşîyayan. Nê averşîyayîşî de pêwa kerpîç û kereyan pê beton, asin, kîremît, tuxla, mermer, cam û swb. malzemeyan sitareyê xo awan kenê ke temamê înan fabrîka û atolyeyan de virazenê û eşteyê înan roc bi roc zêdyenê; hewa, aw û herîya xoza kenê lîmin.

Cilûbergê xoradayîşî ke bi îcadkerdişê derzîna deştişî bi destan postê heywanan û lîfê nebatan ra viraştêne û bi îcadkerdişê rişta û dolabanê ristişî û dezgehê çulagîye ke bi qiwetê mil û destan birîsm, peme, mûyî û peşmî kerdêne la û ê layî dezgeyê çulagî de kerdêne qumaşê cilûbergan, rocê ma yê eyroyî de ageyrnayê qumaş û pirtûyê ke peme, keten, rês(peşmî), birîsm, keşmîr, angora, seten, polyester, naylon, akrîlîk û lateks ra virazenê û fabrîkayanê qumaşî de ke her hebe zerarê pîlî danê xoza û ekolojî ro yenê bernayîş. Yeno zanayîş ke semedê domnayîşê cuyînê ganeyan aw, hewa û herî cayêkê muhîmî gênê. Eyro semedê bikarardişê awbendan, dûyo lîmin ê fabrîka û wesayîtanê resî hewayê jehrî varneno. Olkyanûsî bi eşteyê awî û huşkan ke eserê însanan ê û zafê înan jehrî yê ganeyê derya û okyanûsan nêweş konê, jehrî konê û mirenê. Xirakerdişê xoza û ekolojî dir vuryayîşê awhewaye virazêno, dinya germ bena û her ke şino awe rîyê dinya kêmî bena û nê awayî ra hem însanî hem zî heme çeşîdî ganeyî zerar vînenê.

Helbet mîyanê heme vînayîşan de îcadkerdişê hacetanê xopawitişî semedê xoza û merdimahî zîyankarîya tewr girde bîya. Hacetê pawitişî ke çekanê sîyin, esteyîn û darînan ra pêk yenê vernî de semedê xopawitişî ameyê viraştiş la her ke wext derbas bîyo mexsed û hedefê bikarardişê înan zî bedelyayo. Çekê ke bi amancê xopawitişî virazyayê bîyê hacetê bicaardişê mexsed û hedefanê şexsan, koman, komelan û dagirkeran. Bi kifşkerdişê barûtî û çekadiran hetê dagirkeran ra welatî zêdetir ameyî dagirkerdiş û bi tûtan, cinîyan û extîyaran wa însanê sivîlî her wextî zêdehîrî ameyî qetilkerdiş. Eynî awayî bi hezaran dewî, qeza û şaristanî ameyê xerakerdiş. Vîrê merdimahî ra nêşino ke senîn hetê Dewletanê Yewbîyayeyan ê Emerîka ra şaristananê sey Hiroşîma û Nagazakî de atome ameye bikarardiş û finakêke yo ke netewedewletê dagirker û emperyalîstî semedê nefanê xo çiqas eşkenê însanetî ra vecîyê. Eynî awayî hetê dîktatoro dagirker û gunewer Sedem Huseyînî ra serê kurdanê Başûrî de bikaradişê çekanê kîmyewîyan sey şermêko pîl kewt tarîxê merdimahî.
Bi şeranê ke bi sîleh û teyaranê şeran heta nika şaran ser de ameyê kerdiş, bi milyonan însanî ameyê qirkerdiş û ameyê koçberkerdiş. Teqnayîşê nuklerê Çernobîlî zî eserêkê desthilatê çimveyşanan bî. Bi kilmî ma eşkenê nê vacê ke her îcadêkê merdiman semedê însanetî, xoza û ekolojî merg bîyo. Ma vînenê ke xozaya ma eyro birîndar a û eke bi nê awayî şoro do ver bi mergî şoro. Ma çiqas xozaya xo amancanê dagirker, kapîtalîst û desthilatê çimveyşanan ra bipawê û pak bigîrê ma do hende bi tenduristî û bi hizûr bicuyî.



Zaza Cebelî



## Netîceya prosesî

Heyana ewro şîyayîşê prosesî zaf giran-giran ravêreno. Nê warî de komîsyon zî her çiqas giran têgêreno, la enka zî heme kombîyayîşê xo qedênayî. Babeta tewr muhîme, komîsyonî hema zî karê xo nêkerdo. Aktorê nê prosesî Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan o. Enka ganî komîsyon Rayberê Şarê Kurdî reyde pêveynayîşê xo bikero û bigoştaro. Hînê badî pêşnîyazanê qanûnê bingeyî bido meclîs û meclîs rengê xo dîyar bikero. Heyana ewro hukmatê AKP û MHP’yî gamêka şênbere nêeşte û hewayê her wextî xapênayîşî domnenê. Çîyo tewr muhîm zî nameyê nê prosesî hema zî dîyar nîyo. Hewayê papaxanî qiseyanê xonê beyatî şixulnenê. Hetê bînî ra vanê Rayberê Şarê Kurdî reyde muzakere çinî yo, eke îcab bibo tena goştarî kenê. Ana aseno ke hema psîkolojîyê şerê taybetî gurênenê. AKP’yî hema zî nê kompleksê şerê taybetî ra fek veranêdayo. Nê kompleksî heyana ewro xo qedênayo û seba ke şaro kurd nêsirasno. Ewro hînê mecbur mendê ke Rayberê Şarê Kurdî reyde pêvînayîş kerdê û nêeşkenê ke nameyê pêvînayîşê newî bikerê. Her çiqas nameyê komîsyonî Komîsyonê Demokrasî, Wayûbiratîye û Paştîdayîşê Neteweyî yo, nameyo kurdî tede çinî yo.

Eke AKP’yî heyana no tewr zîhnîyetê şerê taybetî ra fek veranêdo, werte de çekî nêaseno. Çîyo tewr muhîm zî bawerî ya. Nê sebebî ra şaro kurd heyana ewro qet bawerîya AKP’yî nêkeno û nêkerda. No polîtîkaya xoxapênayîş û xejilnayîş o. Nê tewr sîyasetê zexilnayîş û demdergkerdişî ra nêeşkenê ke serbikerê. Peynîya xoxapênayîş û xejîlnayîşî heyana key dewam kena? AKP hewayê lûye boçe kay dano, boça xo rey-rey hetê Putînî ra kay dano û rey-rey zî hetê Trumpî ra kay dano. Tewr peynî de zî kewt veradîya Trumpî. Trumpî ra çi girot çi dayo hema dîyar nîyo. Polîtîkaya Erdoganî hewayê Trumpî bazirganî ya û kam ke zaf peran bido, boçe hetê înan ra kay dana. Erdogan bi taybetî zî sîyasetê xonê qilêrinî gurêneno û vano “Wa kurd maya xo nêveyno, ma heme çîyan kenê”. Pêveynayîşê Erdogan û Trumpî seba Rojawanî çi dayo çi giroto, hema zî dîyar nîyo. Nê pêveynayîşî ra dime çeteyê Colanî qet asan nêvindenê û heme tewr ra gala Rojawanî kene. Çapemenîya tirke Rojawanî ser polîtîkaya şerê taybetî eynî fekî ra dana şixulnayîş.

Heyana statûyê Rojawanî çareser nêbo, Tirkîya de babeta prosesê newî aver nêşina. Bi esil ray û raybazê çareserîya nê prosesî hetê Tirkîya ra û hetê kurdan ra xeta sûr a. Bi esil babete ganî verê verkan xeta sûre çareser bibo û hînê badî prosesê çareserîya demokratîke bi rêbazê asanî ra ramîno. Nê sebebî ra peynîya menga teşrîna verêne de heme çîyî bi zelalî dîyar benê. La rewşa komîsyonî zî muhîm a. La çi heyfo ke pisgirêkanê seserre nêeşkeno çareser bikero. No tewr zîhnîyeto neteweperest hema rewa-rewe sist nêbeno. Nê warî de wext lazim o. Çapemenîya tirke û çapemenîya kemalîstan hewayê şerê taybetî xo gurênenê û jahrê neteweperestî dorûdormeyê xo de vila kenê. Nê rojan de pêveynayîşê Erdogan û parlamenteranê Partîya DEM’î çapemenîya umûmî de zaf ame nîqaşkerdiş. La no warî de gorê mi rexnekerdişê hetê DEM ra  tikê neheqî virazîya. Heme çî bi kareyê yew vêneyî ra niqaşkerdiş zaf raşt nîyo û îcab nêkerdê zî  rayaûmûumîye zaf  bêro niqaşkerdiş. Dewlet Bahçelî zî hewayê papaxanî xo dibare keno, la huner çinî yo. En muhîm çîyî zî rêxistinbîyîşê komelê sazî û dezgeyano. Nê komelî çiqas xo rêxistin bikerê se û proses hîna bi asan aver şino.




# Tiştanok

Gelî hêjayan; mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1- Pênc pênc in***
Xwişk û biran e
Hertim bi te re ne
Ew çi ye?

***2- Melayê kumsor***
Ezan dide qoreqor
Ne ew nimêj dike
Ne jî cemeata wî ya li dor
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***
**1-** (Tilî û pêçî) **2-** (Dîk)

# Şerîfa razî nabe

**Hesen Hemkê**

Şerîfo her dem gilî û gazincan ji hevjîna xwe dike û hevalên wî şîretan lê dikin lê çi dike nikare hevjîna xwe razî bike.

Dawî Şerîfo dibêje hebe tune be wê melayê gund çareseriyekê ji rewşa min re bibîne. Şerîfo dibêje Gelek fen û fûtên meleyan hene û dibe ku şîretekî baş li min bike.

Şerîfo diçe ba melayê gund û dibêje ez çawa dikim ez nikarim hevjîna xwe razî bikim.

Melayê gund dibêje tu îro nû çû malê xwarin çi be pesnê xwarina wê bide.

Şerîfo çû malê, çawa giha malê got ez birçî me ka xwarinê bîne.

Şerîfa jê re xwarin anî û Şerîfo bi geza pêşî re got: Min di hemû jiyana xwe de xwarineke wiha xweş nexwariye.

Ez qurbana wan destên ku hazir kirine. Destên ku ev xwarin hazir kirine tucaran nerizin.

Şerîfo bi her gezekê re pesnê xwarinê dida û tiştên gelekî xweş digotin.


Êdî Şerîfa xwe nema girt û hema rahişt beroşê û li nava serê Şerîfo da û pê re got: Heyla mala te ne ava û ev xwarin li te bibe keratî û jehra marê kor.

Şerîfo matmayî ma û nizane di ku de şaştî kiriye.

Şerîfa got; Hey bê nan û xwê. Hey malmîrat ev çend sale ez xwarinê çêdikim te rojekê pesnê min û xwarina min nedaye lê îro te her tiştê xweş ji bo xwarina ku cîrana me aniye got.




# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Roj ***5-*** Cinavkek ***7-*** Qurban ***8-*** Daçekek ***9-*** Rojnameyeke kurdî … Azadiya ... ***13-*** Hal, dirûv ***14-*** Ne bejî ***16-***Giraniya mirov li ser pişta xwe hidigire ***19-*** Saxlem, dirust ***20-*** Agir ***21-*** Alaveke kolana bexçeyan ***22-*** Ol ***25-*** Daçekek ***26-*** Fediyokî ***28-*** Serhildan

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Eşîreke kurdan
***2-*** Lewra
***3-*** Hewcedariya avê
***4-*** Derew
***6-*** Gotina pêşiyan (Reva pisîkê heta ... ye)
***10-*** Kesên nikarin biaxivin
***11-*** Darbest
***12-*** Nû, bêcir
***15-*** Vê carê
***17-*** Varyenteke gotina Mirov
***18-*** Fêkiyekî havînê yê navdar
***20-*** Hunermendekî ermenî yê bi kurdî distira
***23-*** Afiyet
***24-*** Kar û xebat
***27-*** Rojeke hevteyê

## Bersiva hefteya borî





Fatma Taşli Tunç

# Keçê bila zarok bixwin

***Rojekê xalê Seydo ji Midyadê diçe Nisêbînê mala keça xwe. Diçe sûka Midyadê, ser dikanekê ji dikandar buhayê qidam, mewîj, gûz û hejîran dipirse:***

- Xwarziyê min, qidamên te bi çiqasî ne?

- Bi deh weraqan in xalê min.

Xalê Seydo dibêje, 'weeeeehh, çawa çê bû yabooooo'.

- Lê mewîj bi çi ne?

- Ew jî bi duwazdehan in xalo.

Xalo, 'weeeeeeehhh ma bû çi yabooooo'.

Gûz û hejîran, bastêq û mewîjan û qidam û behîv û dendikan... tevde bazar dike û yek bi yek û her carê jî destê xwe di bin bêrîka xwe de digerîne û dibêje, 'weeeeeeehhh ma bû çi yabooooo'.

***Xalê Seydo ji dikanê derdikeve û destê xwe di bin bêrîka xwe de digerîne û bi xwe re diaxive:***

-Ma êdî tiştek nayê kirîn yabo!

Êdî çerez û fêkî bûne xwarinên taybet, ma bila em ji nêzan bimirin êdî!

Xalê Seydo dikeve erebeya Nisêbînê û diçe mala keça xwe destvala.

Diçe li derî dide, keça wî tê ber derî û dibêje:

- Ew kî yeee?

- Ez im ez keça min bavê te.

***Dema ku keça wî derî vedike û bavê xwe li ber derî dibîne, ji kêfa diqîre û dibêje:***

- Wîîîîî bavooooo, tu bi xêr hatî bavo. Me pir bêriya te kiribû, bavo. Azad, Meryem, Gulbînê hela werin kî hatiye, kalikê we hatiye.

Dema ku zarok dayika xwe dibihîzin û her sê bi hev re bazdidin ber derî.

Bi kêfxweşî bazdidin pêşiya kalikê xwe. Wî maç dikin, hembêz dikin, bi rû û simbêlên wî dilîzin. Xalê Seydo geh li keça xwe dinihêre û geh li neviyên xwe:

- Keça min , îro li Midyadê beriya ku ez werim, ez çûm sûkê min ê ji zarokan re qidam, hejîr mewîj, gûz, behîv û bastêq bistanda...

Lê Xalê Seydo dawiya gotina xwe nayne.

***Keça wî bi ken dibêje:***

- Na na bavo, ne hewce ye ez gorî, tiştek nabe.

Dema ku zarok dibihîzin ku kalikê wan behsa fêkiyan dike hema her sê zarok jî bi kalikê xwe ve radipelikin û bi hev re dibêjin, kalo kalo kalo û wî maç dikin û xwe diavêjin ber sînga wî û wî vedixepirînin.

***Dayika wan bi dengekî nizm dibêje:***

- Zarokno, ka dev ji kalikê xwe berdin, kalikê we westiyaye.

Lê zarok qet guh nadin dayika xwe û her berdewam dikin.

Dayik vê carê dengê xwe bilind dike:

- Lawooo, min got dev ji kalikê xwe berdin!

Xalê Seydo li keça xwe dizîvire û hinek bi dengekî hêlî dibêje:

- Keça min, bihêle bila zarok bixwin!

Dev ji wan biqere, bira bixwin.

- Wê çi bixwin Bavo?

- Bila xeyalên kalikê xwe bixwin. Ma qey xeyal jî bi pera ne keça bavê xwe!



# Deng jî Radizên!



Hogir Berbir

Nivîskar Îbrahîm Kaya, piştî du pirtûkên ku bi zimanê tirkî nivîsandibû û weşandibûn, vê carê bi vegera malê re berê xwe da zimanê xwe yê zikmakî û dest bi nivîsîna bi kurdî kir. Pirtûka çîrokan a bi navê 'Dengên Razayî', ku ji nav weşanên Aramê derçûye, yekemîn pirtûka wî ya bi kurdî ye. Nivîskarê me hîn di girtîgehê de ye.

Edîtorê pirtûkê di dawiya pirtûkê de wiha dibêje: "Dengên Razayî' di nav bêdengiyê de diqîre, dibe qêrîna kêliyên winda... Ka em bi hev re li wî dengî guhdarî bikin û di wê neynikê de li xwe mêze bikin!.."

Ev gotin bi awayekî kûr naveroka pirtûkê dide der. "Dengên Razayî" ji 10 çîrokan pêk tê, ku navê pirtûkê jî ji yek ji wan çîrokan hatiye wergirtin. Pirtûk 104 rûpel e û çîrokên tê de ev in; Dengên Razayî, Şeva Qedrê, Kolanên Ker û Lal, Pirsên Bêbersiv, Dêra Perîxanê, Berfa Sor, Tabût, Zarokên Sêwî, Jina Berxwedêr û Xecê.

'Dengên Razayî' wekî stranekê bifikirin; straneke ku ji kûrahiya bêdengiyê bilind dibe. Ew ne tenê notên xemgîniyê û kêliyên winda, lê di heman demê de ahenga hêvî û berxwedanê ye. Îbrahîm Kaya ne tenê bi pênûsê dinivîse, lê wek kemançeyekê têlên bîranînan dilerizîne û melodiyên kûr derdixe. Her çîrokek rêwîtiyek bixwe ye; rêwîtiyek ku ne tenê di nav rûpelan re derbas dibe, lê di kûrahiya ruhê mirov de diherike. Mirov ber bi rêwitiya demên borî, şahidiya têkoşînek bêhempa û hewlên bîranînên vedibêje ku di nav demê de asê mane.

"Dengên Razayî" ne tenê wek albûmek serpêhatiyan e, lê di heman demê de çirayeke ku tariya dîrokê ronî dike. Li dewsa xwe şopa lingên kesên bi dirbeke mayînde hiştî ye nîşan dide. Di rojên dijwar de heval û dostê roja xwe ye, xwe bi rêya heqîqetê ve berdide û hêzê dide tarîtiya dema tê re derbas bûye.




'Dengên Razayî' neynikeke kûr e. Di vê neynikê de, em berxwedana Bedran li hember xiyanetê dibînin. Di 'Dengên Razayî' de, çîrokên Şeva Qedrê, Kolanên Ker û Lal, Pirsên Bêbersiv, Dêra Perîxanê, Berfa Sor, Tabût, Zarokên Sêwî, Jina Berxwedêr û Xecê hene

Çîrokên di pirtûkê de ne tenê bûyerên ji hev cihê ne, lê wek xeleka zincîrekê bi hev ve girêdayî ne. Her yek ji wan beşek ji bûreyên rastîn ên erdnîgariya me ya hevpar e. Ew bîranînên bêhempa yên têkoşîna azadiyê bi zimanekî çîrokî vedibêje; ne tenê agirê demên borî, lê di heman demê de germiya dilê roja îro ye. "Dengên Razayî" wekî çirûskeke mayînde di nav demê de dengekî mayînde diafirîne; dengekî ku ken û girî, şer û aştî, barê giran û sivik bi hev re tîne û rastiyên jibîrkirî ronî dike. Serdemeke bestî bi zelalî radigihîne û vedibêje.

Pirsên ku di kûrahiya şevê de bêdeng dimînin, di nav rûpelên pirtûkê de ne tenê bersivê dibînin, lê mirov teşwîq dikin ku kûrtir bifikire. Nivîskar bi van çîrokan pirsên giran dipirse: Dayikek ku kurekî xwe şehîd daye, xizmekî xwe di girtîgehê de asê maye, û yek jî li çiyan li ber xwe dide, wateya hebûnê di nav şertên dijwar de çi ye? Di çîroka "Jina Berxwedêr" de, em dibînin ku jin serî natewîne, gavekê diavêje û dest bi rojiya birçîbûnê dike. Ev çîrok ne tenê rastiyan aşkere dike, lê mirov vedixwîne ku li heqîqeta xwebûnê bigere.

Kêliyên ku şopên kûr ên di bîra gelê kurd de hiştine, di van çîrokan de, ne tenê têne vegotin. Zindan, berxwedan û sirgûnî di van çîrokan de ne tenê cihên bûyeran in, lê sembolên têkoşîn û hêviyê ne. Bi hesteke şoreşgerî, ev kêliyên dîrokî tên hilgirtin û digihîjin xwendevanan ku tu carî neyên jibîrkirin. Her çîrokek hêz û baweriyê dide û bingeha pêşerojê ava dike.

'Dengên Razayî' neynikeke kûr e. Di vê neynikê de, em berxwedana Bedran li hember xiyanetê dibînin. Çîroka civakî ya zarokên kurd a "Şeva Qedrê"; şahidiya çalakiya "Kes Nikare Roja Me Tarî Bike!.." ya di "Kolanên Ker û Lal" de; zarokekî penaber ê di "Pirsên Bêbersiv" têdikoşe; "Dêra Perîxanê" ya ji aliyê xezînegeran ve tê talankirin, lê ji hêla parêzvanên azadiyê ve têne parastin; "Berfa Sor" a di navbera sînoran de dibe rêya jiyaneke nû û penaberî xwe dide der; "Tabût" a di şikeftek kevnare de bi gotina "Jin, Jiyan Azadî" dibe jîngeh û himendiya şerê navxweyî dipirse; "Zarokên Sêwî" ku çîroka dayika Senemê û Mûsayê qet venagere, raza di dilê xwe de veşartiye û heta hetayê ji kesî re negotiye vedibêje; û dawî, "Xecê" çêbûna ala Kurdistanê rave dike.

Ev çîrok ne tenê çîrok in; ew xezîneyeke gelêrî, herêmî, netewî û şoreşgerî ne. Her xwendevanî ber bi cîhaneke nû ve dibe, cîhaneke ku tê de xweza, berxwedan û bîranînên li Kurdistanê bi hev re nîşan dide.

Bo vê careke din dibêjim; "Dengên Razayî" ne tenê pirtûkek çîrokan e, neynikeke ku em tê de xwe, dîrok û têkoşîna xwe dibînin. Ji ber vê yekê hêjayî xwendinê ye.




Servîsa Çandê

***Li Qeladizê konsera Şadî Xulamî û Hesen Zeyafetî***

Li Qeladizê bi armanca xurtkirina peywendiyên hunerî di navbera başûr û rojhilatê Kurdistanê de konserek hat dayîn. Konser li Yarîgeha Şehîd Mamosta Mehdî ya li Qeladizê bi pêşengiya Rêveberiya Rewşenbîrî û Hunerî ya Raperînê, Mala Kelûpurî û Hunerî ya Qeladizê û Navenda Kerîmî Eleke ve hat dayîn. Di konserê de hunermend Şadî Xulamî û Hesen Zeyafetî derketin ser dikê û bi stranên xwe gel coşandin.

***Xwendekaran 'Koma Arî' ava kir***

Xwendekarên Zanîngeha Helebê yên ji Efrîn û Kobanê komeke muzîkê ya bi navê "Koma Arî" ava kir. Komê navê "Arî" wek nîşaneya reseniya xwe hatiye hilbijartin û kom armanc dike ku li gorî reseniya navê xwe stranên gelerî bistrîne. Ji avakirina xwe vir ve, kom li şevbuhêrkên li Helebê stranên xwe pêşkêşî gel dike.

***Pêşandana amûrên çandî***

Komek bi navê Sewt El Zakîra Sewat El Selam (Dengê Bîr û Dengê Aştiyê) ya ku ji 10 kesan pêk tê bi hevkariya Rêxistina Mala Çand û Hunerê pêşangehek li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya li bajarê Qamişloyê vekir.Di pêşangehê de, amûrên ku balê dikişînin çandên pêkhateyên kurd, ereb, suryan-asûr, ermen, çaçan û çerkez ên li Reqayê, hatin pêşandan. Şêniyên bajarê Qamişloyê, hezkiriyên çand û hunerê serdana pêşangehê kir.

***218 fîlman serlêdana Mîhrîcana Fîlman a Rojava kiriye***

5emîn Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Rojava dê di navbera 13-20ê mijdarê de, li Qamişloyê bê lidarxistin. Mîhrîcan ji aliyê Komîna Fîlman a Rojava ve tê lidarxistin û bi dirûşma "Çîrokên hevpar, sînemaya azad" li dar dikeve. Mîhrîcan dê li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo û Navenda Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamyayê (TEV-ÇAND) bê lidarxistin.

Komîna Fîlman a Rojava ,13ê tebaxê, lidarxistina mîhrîcanê îlan kir. Ji wê demê heta niha 120 fîlmên ji her çar aliyên Kurdistanê, hundirê Sûriyeyê, welatên Ewropayê, Amerîka û Afrîkayê û welatên Rojhilata Navîn serdana mihrîcanê kiriye. 30ê îlonê dema serlêdanan bi dawî bû. 218 fîlman û 15 senaryoyan serlêdan kir. Hefteyên pêş, dê lijneya hilbijartina fîlman û komîteya amedekar fîlman hilbijêre. Li gorî agahiyan, derdora 70 fîlm dê bên hilbijartin.



## Ferheng

## Lîberalîzm

**Navê giştî yê doktrînên ku destwerdana di warên siyasî, olî û aborî de red dikin û diparêzin ku maf û azadiyên takekesan di têkiliyên di navbera dewlet, civak û takekesan de werin pêşîn kirin.**

**Peyva lîberalîzmê, di warê siyasî de li pêşberî zagonan wekheviyê û divê azadiya mirovê ku dikaribe rêveberiya xwe bixwe bibijêre, li pêşberî derdestiya olî, azadiya wijdanî, li dijî mudaxaleya dewletê ya di dan û stendana aborî de azadiya aboriyê diparêze.**

**Lîberalîzm di sedsalên 18 û 19an de wekî beşek ji nêrîna teolojîk a çîna navîn a ewropî derket holê, ku li dijî pergalên dewletên mutleq bû. Ev nêrîna cîhanê bi giranî ji hêla qanûna xwezayî û berjewendîparêziyê ve bandor bû. Li gorî qanûna xwezayî, mirov xwedî hin mafên destnedayî ne ku di nav wan de ya sereke mafê milkiyetê ye. Armanca sereke ya "peymana civakî" ya ku pergalên civakî û dewletên nûjen li ser bingeha wê ne, ew bû ku vî mafî di nav pergalek hiqûqî ya aram de misoger bike. Ev nêzîkatiya mafên xwezayî ku di nav îdeolojiya lîberal de, nemaze di berhemên fîlozofê îngilîz John Locke de, forma xwe ya herî têkildar dît. Li aliyê din jî ji hêla Adam Smith ve ku wekî bavê aboriya siyasî ya klasîk tê hesibandin, ji perspektîfek aborî ve hat analîzkirin. Smith jiyana aborî ya civakê wekî organîzmayek xwezayî pênase kir. Li gorî wî, aboriya kapîtalîst ji hêla qanûnên objektîf û serbixwe yên ku ji îradeya mirovan derdikevin ve dihat birêvebirin. Jîngeha herî guncaw ji bo van qanûnan ku bêyî ti xirabkirinê bixebitin, pêşbaziya azad bû. Di sîstemek dabeşkirina kar û pêşbaziya azad de, her yekîneya aborî, çi hilberîner be çi xerîdar, dê berjewendiya xwe ya kesane bişopîne û di heman demê de û bixweber xizmeta xweşiya civakê bi tevahî bike.**

**Di bingeha lîberalîzma aborî de têgeha homo oeconomicus (mirovê aborî) yê rasyonel heye, ku bi şopandina berjewendiya xwe, di heman demê de xizmeta berjewendiyên civakê jî dike. Ji ber ku kes nikare berjewendiyên takekesek rasyonel ji wî çêtir bizanibe, destwerdana îradeyên ji bilî îradeya takekesî, wekî dewlet di sûkê de, dê rê li ber takekesek bigire ku berjewendiya xwe ya kesane bişopîne û di heman demê de û bixweber xizmeta xweşiya civakê bi tevahî bike, bi vî rengî prensîba "bextewariya herî mezin a hejmara herî mezin" ku ji hêla fîlozofên kêrhatî Bentham û J.S. Mill ve hatî danîn bi dest bixe. Ji ber vê yekê, divê dewlet ji sûk û aboriyê were derxistin.**

**Lîberalîzma aborî li ser têgeha homo oeconomicus (mirovê îktîsadî) yê aqilmend hatiye damezrandin ku bi şopandina berjewendiya xwe, xizmeta berjewendiyên civakê jî dike. Ji ber ku kes nikare berjewendiyên takekesek aqilmend ji wî çêtir bizanibe, destwerdana îradeyên ji bilî îradeya takekesî, wekî destwerdana dewletê di bazarê de, dê rê li ber takekesek bigire ku berjewendiyên xwe yên kesane bişopîne. Di heman demê de bixweber xizmeta xweşguzeraniya civakê bi tevahî bike, bi vî rengî prensîba "bextewariya herî mezin li bo hejmara herî mezin" ku ji hêla fîlozofên utilitarîst Bentham û J.S. Mill ve hatî danîn pêk bîne. Ji ber vê yekê, divê dewlet ji bazar û aboriyê were derxistin.**

**Di wêjeya siyasî ya hemdem de, dewletek lîberal dewletek e ku hewl nade newekheviyên ku ji cûdahiyên aborî û civakî yên di navbera takekesan de derdikevin rast bike û di warê civakî û aborî de rolek çalak û rêkûpêk nalîze.**



xwebûn

13 - 19 Cotmeh 2025/ e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 304

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Divê bi rêxistinî pêşî li van polîtîkayan bê girtin



Rohat Bulut


Bi salan e polîtîkayeke talan û qirkirina xwezayê li ser axa Kurdistnê tê meşandin. Bi taybetî jî dewlet û desthilat bi vê qirkirinê jî bi destên cerdevan û hin gundiyan pêk tîne. Di heman demê de jî bi rêya şîrket û dewlemendên herêmê jî talana bin erdê bi pêş dixe û kûr dike. Bi taybetî jî li herêma Botanê talan û qirkirineke kûr tê meşandin. Li dijî polîtîkayên dewletê yên talan û qirkirina xwezaya Kurdistanê di sala 2011an de Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê ava bû. Piştre jî li bajarên herêmê yên wekî Amed, Riha, Dîlok, Wan, Êlih û Mêrdînê şaxên xwe ava kir. Tevgera Ekolojyê ya Mezopotamyayê di çarçoveyê de li dijî qirkirin, talan û tunekirina xweza û ekolojiyê heta niha xebatên xwe meşandiye.


Di 2025an de jî li Amed, Riha û Wanê Komeleyên Ekolojiyê hatin avakirin. Ji her beşên civakê û pîşeyên cur bi cur endam û aktîvîstên di bin banê van saziyên ekolojiyê de hene. Gelek komele, sazî û rêxistinên civakî jî wekî hevkarên Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê di nav xebatan de cih digirin û li dijî qirkirina xwezayê têdikoşin. Rêveberê Komeleya Ekolojiyê ya Amedê Endezyarê Hawirdorê Nejdet Sezgîn li ser xebatên we yên li dijî qirkirina xwezayê axivî. Di nav civakê de her tim behsa parastina xwezayê tê kirin lê Nejdet Sezgîn diyar kir ku ew têgeha parastina xwezayê qebûl nakin jiber ku tê de serdestî heye, hiyerarşî heye.

Li ser xebatên xwe yên bergiriya qirkirina xwezayê Nejdet Sezgîn ev tiştê anî ziman: "Niha hin kes hene dixwazin cihekî talan bikin tune bikin. Heta qirkirina nijadî bi cih bînin. Tişta ku dikeve ser me jî ew e ku em gelê herêmê agahdar bikin; em dibêjin li vê derê qirkirinek heye, talanek heye, xirakirinek heye li vir em jî bi we re li hemberî vêya rawestin. Dema ev hişmendî bi gel re bi pêş bikeve wê demê karê me hêsantir dibe. Lewre "xwedîderketin", an jî "parastina" xwezayê ancax bi gelê herêmê re bi zanebûn dikare bi pêş bikeve. Li Hesendînê jî me wiha kir. Haya me ji mijarê çêbû. Em çûn li gundan geriyan. Me di warê zanistî de agahî bi wan re parve kirin."

> Rêveberê Komeleya Ekolojiyê ya Amedê Nejdet Sezgîn diyar kir ku pêwîst e bi rêxistinî pêşî li van polîtîkayan bê girtin û got: "Li Bestayê 17 madeyên bin erdê hene û berê xwe dane vekirina kanan."

Ev qirkirina xwezayê rê li ber çi vedike, ji bo civakê çi îfade dike, wekî komele bi gundiyan re hatiye parvekirin. Di vî warî de jî Nejdet Sezgîn wiha got: "Me ji wan re zirarên kanên madenan vegotin. Me ji wan re got 'hûn ê di warê tenduristiyê de, di warê ava vexwarinê de, di warê hilberîna ji xwe xwezayê de pirsgirêkan bijîn.' Piştî vê agahdarkirina me gotin 'em ê bikevin nav hewildanan.' Ji bo xebatên wiha em ji herêmê platformê ava dikin ku ji pêkhateyên dilsoz ên gelê herêmê pêk tên. Bi vê şêwazê em têkoşîn û berxwedanekê ya li dijî qirikirin û talanê bi pêş dixin. Heta niha pilatformên me yên berxwedanê yên li herêmên di bin gefa talan û qirkirinê de ne kar û xebatên xwe dimeşînin. Her wiha li gelek deverên din jî hewildanên me yên avakirina platformên herêmî hene. Herî dawî li Şirnexê me Platforma Ekolojiyê ya Şirnexê ava kir."





**Sedemên talana dewletê**

Gelek sedemên talana xwezaya Kurdistanê ya ser erd û bin erd hene. Nejdet Sezgîn, sedemên dewletê yên talanê wiha bi lêv kir: "Niha li Bestayê 17 madeyên bin erdê yên bi nirx hene ku li her derê tune ne. Ji ber wê yekê jî berê xwe dane vekirina kanên madenê. Ev madeyên xam ên ji bo afirandina pola, hesin, çînko, kron yanî madeyên ku di endustriyê de tên bikaranîn. Bi granî jî van madeyan ji bo endustriya şer, wekî ûranyûm, platînyum û hwd. Ji Erzinganê heta Botanê ev cihên ku maden lê hene yek bi yek tespîta wan hatiye kirin. Gelek ji van cihan jî îhaleyên wan hatine kirin. Niha hewildanên wan ên qirkirinê ji bo vê ye. Ji bo vekirina kanan jî qirkirineke ser erd û bin erd pêk tînin. Sedemeke din di warê ewlehiyê de desthilatî dixwaze li gorî berjewendiyên xwe vê talan û qirkirinê pêk bîne. Sedemeke din jî koçberkirina gelê herêmê ye. Yanî bê vê rêbazê dixwin li serêmê koçberiyekê bi pêş bixin, herêmê ji mirovan xalî bikin."

**'Ew kes kî dibe bila bibe dê teşîr bibe'**

Gelek kesayetên ku dibin şirîkên sûcê talan û qirkirinê hene û di nav civakê de ne. Li ser vana jî Nejdet Sezgîn da zanîn ku ew kes kî dibe û ji kîjan komele û partiyê dibe bila bibe dê teşîrkirin ev tiştê anî ziman: "Bêguman xweza ji bo me pîroz e. Hebûna hemû candaran ji xwezayê ye. Dîsa em bêjin pêdiviya xwezayê bi parastinê tune ye. Tenê em zirarê nedinê, qirkirinê lê nekin, talanê pêk neynin bes e. Ji ber vê yekê kî dibe bila bibe, dema ku destên xwe dirêjî dîrok, çand, nasnameya kurd û Kurdistanê kir em bi ti awayî qebûl nakin. Em li hemberî van kesan in. Di vî warî de tu tawîza ku em bidin wan tune ye. Ew kes kî dibe û ji kîjan komele û partiyê dibe bila bibe ji bo teşîrkirinê çi ji destên me bê em ê bikin. Em dikin û em ê bikin. Em bi daxuyaniyên xwe jî vê yekê dikin û em bi ew rêxistin, sazî, partî û komeleyên ku di nav de cih digire re bi awayekî aşkera dibêjin em li hemberî vê ne."

Ji bo pêşîgirtina vê rewşê jî Nejdet Sezgîn da zanîn ku bi saziyên peywendîdar re xebatên wan ên bergiriyê hene û ev tişt got: "Di hemû hewildan û têkoşîna me de prensîbeke me heye; em bi daneyên di destên xwe de di warê zanistî de bandora neyînî ya li ser herêmê em bi wan re nîqaş dikin. Bi her awayî em hewil didin ku ew kesê ku pêçiya wî di qirkirin û talanê de heye îkna bikin ku wî karî neke. Dema ku hewildanên me bê encam man, wê demê em ji bi şêwazên xwe yên alternatîf dikevin nav têkoşînekê. Her wiha bi rêveberiyên herêmê re jî helwesta me ya hevgirtî ya li dijî polîtîkayên qirkirênê heye.

## Aştiya civakê bêyî aştiya ekolojiyê nabe

Komeleya Ekolojiyê ji bo pêşîgirtina talan û qirkirina xwezayê ne tenê bi çalakiyan di heman demê de bi atolye û berwerdehiyê jî di nav hewildanan de ye. Di vî warî de jî Rêveberê Komeleya Ekolojiyê ya Amedê Nejdet Sezgîn ev tiştê anî ziman: "Li aliyê din li ser qirkirin û talan û ekolojiyê ev 7 sal in em atolyeyan li dar dixin. Wekî mînak têkiliya jinê û ekolojiyê, têkilya cotkarî û ekolojî, têkiliya civakê û ekolojiyê li ser 7-8 mijaran me atolyeyên xwe li darxistin. Hemû atolyeyên me jî rastî eleqeyeke mezin hatin. Ji her beşên civakê, saziyên civakî beşdariya atolyeyên me bûn. Em hewil didin ev atolyeyên me sûdewar derbas bibin. Niha bi rêk û pêk em xebatên xwe dimeşînin. Dîsa em kovarekê derdixin. Kovara Jiyana Ekolojîk. Ji çar mehan carekê dertê û niha hejmara me ya 6emîn derketiye. Hejmara me ya dawî li ser "aştiya ekolojiyê" bû. Bêguman dema em dibêjin aştiya ekolojiyê aştiya civakê jî di nav xwe de dihewîne. Aştiya civakê bêyî aştiya ekolojiyê nabe, aştiya ekolojiyê jî bêyî aştiya civakê nabe. Em armanc dikin ku hevsengiya xwarin û vexwerinê xira nebe û hevsengiya enerjiyê xira nebe. Xirabûna vê hevsengiyê dê zirar û xeteriyên mezin bi xwe re bîne. Em aştiyê dixwzin."

## Yek ji armanca desthilatiyê civak e

Ev polîtîkaya dewlet û desthilatdariyê ye û komeleya ekolojiyê jî gelê herêmê şiyar dike lê ji herêmê gelek kes jî hene ku di vê talan û qirkirinê de cih digirin. Heta di nav wan kesan de, kesên di saziyên civakî de jî di asta rêveberiyê de cih digirin jî hene. Li ser pirsa, "Li dijî van kesan çi helwest û sepanên we hene?" jî Nejdet Sezgîn ev tiştê anî ziman: "Ez dikarim wiha bêjim, niha sê armancên desthilatdariyê hene; yek jê dixwaze dîroka wê herêmê tune bike. Ya din avakirina birdozî û hişmendiya xwe ye. Ya sêyemîn jî aborî ye. Ji ber ku heke dîroka gelê herêmê tune bibe hişmendî, bîr û bawerî jî tune dibe. Ew jî pişaftinek e, qirineke nijadî ye. Heke dîrok tune bibe, hişmendî û bawerî tune bibe êdî kes ji bo herêmê nakeve nav tevger û têkoşînekê jî. Ji bo ku nifşên nû ji tiştekî ne haydar bin. Heke dîrok tune bibe hişmenî jî tune dibe û ev jî rê dide ku desthilat dikaribe bi hêsanî birdoziya xwe bi cih bike. Bi polîtîkayên pişaftinê vê dikare bikin. Heke piştatin bi pêş bikeve manewiyat jî namîne. Yanî di aliyekî de aliyê madî yê civakê ji holê radike li aliyê din jî manewiyatê ji holê radike. Ew jî dibe sedema koçberî û qeyranên kûr ên aborî. Ev jî encama polîtîkayên zordestiyê ye. Ev jî ji aliyê desthilata navendî ve bi pêş dikeve û ji wir li herêmê vê yekê pêk tînin. Li herêmê jî desthilat yan jî kesên nêzî desthilatê yên berjewandiyên wan têde heyî dibin amûrên van polîtîkayan. Di heman demê de gundiyên herêmê jî ji bo van berjewendiyan bi kar tînin. Dema ji gundan ji xwe re alîgiran peyda dike kesekî ku bi hêsanî li hemberî wan derkeve jî çênabe. Li ser vê yekê qirkirin, talan û wêraniyê bi pêş dixin. Heke ji herêmê kes li hemberî wan derkeve dê di nav malbat, eşîr û gelên herêmê de dijmanatî derbikeve. Ev jî dê rê li ber aloziyên kûr vebike. Ev jî yek ji armanca desthilatê ye ku aştiya nav civakê nemîne. Lewma jî vê yekê bi kes û taşeronên herêmî didin kirin."

Nejdet Sezgîn ev tiştê jî anî ziman: "Hezar mixabin birîna me ya herî mezin jî ew e ku kesên berê di nav civak û saziyên civakî de cih girtine, niha li dû berjewendiyên kesayetî ketine. Dewlet jî hemû derfetan dide wan. Ev jî me dike zehmetiyê. Li hemberî wan, dema em dikevin nav hewildanekê em tên li dîwarekî diqelibin. Lê em vê bêjin ji bo me pîvana sereke parastina nirxên Kurdistanê ye. Parastina çand, dîrok, nirxên civakî, xweza û axa Kurdistanê ji bo me esas e, şertê sereke ye."